

## Krîza li Afganistanê û penabertiyê

“Mafê parastinê yê her koma civakî pîroz e. Li hemberî her cure êrîşa li ser hebûna komekê û nirxên bi ser hebûna wê ve hebûna hêza parastinê, ji bilî mafekî dest jê nayê berdan, sedemeke hebûnê ye”. Afganistan û herêmên... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.7***



## Raya Zera zaf derg a

Koyê morî xeylê berz o... Gil de mij û duman qe kêmî nêbîyêne. Dem bi dem gilê koyî bîyênê paka labelê merdim heta şiyenê nêmeyê gilê koyî se nafa bîyêne gujaguja vayî. Va Koye Morî de qe nêbîyêne kêmî. Ko ge gane kewtêne bi... ***Mehmet Guzel / R.9***



## Çavşilî: De ka em bigirîn

“Dayê dayê, birîndarê/birîna dayê pir xedar e” “Dayikên çavbihêsir” “Rondikên çavên dayikan” “axîna dayikan” “Belengazî û fedakariya dayikan...” Em dikarin bi dehan mînakên wiha binivîsînin; mînakên ji jiyanê... ***Mizgîn Ronak / R.2***


# xwebûn

20-26 ÎLON 2021 HEJMAR: 92 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Berxwedêr dagirkeran ditirsînin

Di rojên dawî de li Silêmaniyê 2 êrîşên çekdarî pêk hatin. Bi hevkariya hêzên taybet û îstîxbaratê kurdê welatparêz Ferhad Bariş Kondu birîndar kirin. Endamê Komîteya Malbatên Şehîdan a PKK’ê Yasîn Bulut hat qetilkirin. Lê heta niha hêzên ewlekariyê, hikûmeta Başûr û PDK’ê li dijî êrîşan daxuyanî nedaye û bêdeng e. Gel cenaze bi girseyî oxir kir... ***R.3***



## 29 sal in edalet tune ye

Rewşenbîr, zana, nivîskar, rojnameger û rûspiyê kurd Mûsa Anter (Apê Mûsa) di 20’ê Îlona 1992’yan de ji aliyê hêzên tarî û paşverû yên li Tirkiyeyê ve hat qetilkirin. Kurê wî Dîcle Anter têkildarî doza Apê Mûsa destnîşan kir ku di 24’ê mijdarê de doz dê li Enqereyê bê dîtin û piştî wê jî 9 meh dimîne ku 30 salê dozê tije dibe ku doz bikeve. Anter destnîşan kir ku avahiya dadê heye, lê edalet tune ye û wiha got: “Ji me zêdetir qedr û qîmet dida mirovan. Yekî bihata mala wî çi hebûya dida mêvanê xwe. Tu car nedixwest însanekî kurd biêş e. Bavê min li ser rewşa civaka kurd pir xemgîn dibû. Ji heft salî heta heftê salî têkiliyên wî bi her kesî re xurt bûn.Lê hiqûq tune ye. Edalet tune ye. Saray heye lê edalet tune ye. Ewqas saray... ***Zeynel Bulut / R.6***

## Artêş leşkerê xwe dikuje

Artêşa tirk ji 23’ê Nîsanê û vir ve li Herêmê Parastinê yên Medyayê bi alîkariya hevkarên xwe ve dest bi tevgereke berfireh ya dagirkeriyê kiriye. Têkildarî şer û pevçûnên li vê herêma ku bi her awayî hatiye dorpêçkirin jî navenda ragihandin û çapemeniyê ya HPG’ê li gor derfetên xwe yên heyî rojane agahiyan bi raya giştî re parve dike. Li gor van agahî û dîmenên ku tên parvekirin diyar dibe ku dewleta tirk vî şerî wek şerê man û nemanê dibîne. Bi hemû hêza xwe êrîş dike û hewl dide derb li şervanên azadiyê bixe. Gerîlayên Kurdistanê jî... ***Felemez Ulug / R.8***

## Pirsgirêka ‘yekitiya neteweyî’

Wekî têgeha ‘netew’ têgeha ‘yekitî’yê jî ne peyveke jixweber derketî û temamkirî ye. ‘Yekitî’ya ku di çarçoveya vê nivîsê de beramberî ‘netewe’yê tê bikaranîn, mijarê hîn tevlihevtir û neçaresertir dike. Di nîqaşên aktuel ên der barê polîtîkayên kurdîstanî de ev demek e mijara ‘yekitiya neteweyî’ mijareke sereke ye. Her hêz û rêxistin vê mijarê li gorî xwe û fêmkirina xwe şîrove dikin, dinirxînin. Pirî caran ev peyv bêyî zanîna wateya wê ya bingehîn a qada polîtîk û civakî tê bikaranîn; li gorî helwesta bîrdozî têgeh an tê redkirin... ***Munawer Azîzoglu Bazan / R.2***

# Ciwan û gel li dijî tiryakê bûn yek



Li Tirkiyeyê hejmara kesên ku madeyên tiryakê dikişînin her ku diçe zêdetir dibe. Bi taybetî li Kurdistanê hejmara tiryakkêşan gihiştiye asta herî jor. Meclisa Ciwanên HDP, li dijî zêdebûna tiryak û fihûşê ya di nava civakê de zêde dibe dest bi kampanyayê kirin. Meclisa Ciwanên HDP’ê di 10’ê îlonê de bi dirûşmeya ‘Em xwe ji tiryakê rizgar bikin, jiyana nû ava bikin’ kampanyayek dan destpêkirin... ***Medya Bal / R.3***

## Nexweşiya Epîlepsiyê

Epîlepsî (fê, edr), nexweşiyeke mêjî ye. Ev nexweşî mirovan bê hiş dixe. Bi talerz û pêgiriyan li ser jiyana nexweşan bi bandor e. (Pêgirî, rewşên ji ber nexweşiyan yan jî fîzyolojiya mirov çêdibin. Di epîlepsiyê de pêgirî, pir caran bi ta û lerzê ve derdikeve. Pêgirî di nav gel de wekî [nobet]ê; talerz jî wekî [hewale]... ***Fzt. Mustafa Onal / R.12***

## Apê Mûsa û gundê Stilîlê

Bê çawa Medreseya Sor û Birca Belek bêyî Melayê Cizîrî û Melayê Cizîrî jî bêyî Cizîra Botan çênabe, çaxa mirov behsa Stilîlê bike Mûsa Anter tê bîra mirov û dema mirov qala Mûsa Anter bike, bêyî Stilîlê nabe. Helbet bajarê Cizîrê û gundê Stilîlê du warên cuda ne. Her wiha Melayê Cizîrî û Mûsa Anter... Melayê Cizîrî yê di koşk û bircên girgirek ên mîrê Botan de û Mûsa Anter ê li nav erdê xwe bi zarok, xort û xelkê re.....Ya rastî çaxa min pirtûka Amed Tigrîs ya bi navê "Dîcle û Ferat" xwend û li helbesta li ser Stilîlê ya helbestvan "Baz... ***Seyîtxan Anter / R.5***

## Reng û rû diguherînin

Piştî di adara 2018’an de Efrîn hat dagirkirin, heta niha gelek binpêkirin û sûcên mirovahiyê û şer li dijî gelê Efrînê pêk hatin. Ji bo xelkê Efrînê mecbûrî koçberiyê bikin bi gelek awayan mafên mirovan têne binpêkirin. Ji bo guhertina demografîk pêk bînin gelek mafên mirovan binpê dikin. Dewlet û siyaseta Tirkiyeyê sê sal û nîv in li ser vê yekê dixebitin. Yek ji dosyayên hêzên îslamîst û cîhadîst ên girêdayî Tirkiyeyê girtin û revandin e. Ji roja Efrîn dagir... ***R.6***



## Yilmaz Guney û Xelîl Dag

Tişta ku hiş û giyanê mirov heyî dike; tişta ku hêza biryardayîn, pêkanîna biryaran dide mirov jî asta têkiliyan e ku mirov di navbera hebûna xwe ya takekesî û civakîbûna xwe de datîne... ***Îlham Bakir / R.11***

## Milîtarîzma perwerdeyê

Di pergala perwerdeyê ya li Sûriyeyê de, di dibistana navîn de hefteyê rojekê dersa leşkeriyê hebû. Ne tenê di dibistana navîn de lê di ya amadeyî û heta li zanîngehê de jî salê 18 rojan em dibirin kampeke leşkerî û perwerdeya leşkerî didan me. Jixwe cilê me yê dibistanê jî di rengê yê leşkeriyê de bûn. Di hefteyê de carekê em dibûn leşker û me perwerdeya leşkerî didît. Perwerdekarê me jî leşkerek bû û çawa bi leşkeran re dide û distîne wiha bi me re dida û distand. Xwendekar gelekî ji wan perwerdekarên leşkerî ditirsiyan ji ber cezayê giran didan kesên ku şaştiyekê bike.Di dema dibistana navîn de navê perwerdekarê me Îsa Zeytûno bû. Mirovekî leşker, faşîst û madtirş bû. Ew bi eslê xwe suryanî bû lê ji bo girêdana xwe bi partiya... ***Dildarê Amedê / R.10***

Mizgîn Ronak

# Çavşilî: De ka em bigirîn

“Dayê dayê, birîndarê/birîna dayê pir xedar e” “Dayikên çavbihêsir” “Rondikên çavên dayikan” “axîna dayikan” “Belengazî û fedakariya dayikan...” Em dikarin bi dehan mînakên wiha binivîsînin; mînakên ji jiyanê, ji stranan, ji ajîtasyon û sohbetan! Jixwe têgeha “welat” jî di nava van de ye. Lew welat jî “dayik” e. De ka em hemû gotin û stran û helbestên bi vê naverokê bibêjin, bixwînin, hîs bikin û bi ser xwe de bi ser hev de bigirîn!

Da ku çarenûsa me û dayika me ya reş biguhere! Ma çarenûs wiha diguhere? Ez we nizanim lê ev demek e min şer li hemberî hin têgeh, navandin, hest û ferasetan îlan kiriye! Mesela dayika ku afirîner û hêzdareke bêhempa ye; çima timî belengaz, axkêş û çavşil e? An jî “dayiktî” mecbûr e tiştê û rewşeke wiha belengaz, perîşan, xefakar û peçixandî be? (Lew ev rewş, peçixandin û xwepeçixandin e jî.) Hewce nake em bikevin mijara “serdestiya mêr û bindestiya jinan” lew em hemû serwext in û helbet sedema vê nasnameya “dayiktiyê” ya wiha bêhêz, bêvîn û bêsiûd jî ev mijar e. Lê mesele ew e ku rastgir û çepgir, feodal û şoreşger jî di mijara dayiktiyê de, ji hev naqetin an jî pir dişibin hev. Ji bo wan jî “dayik” tê wateya “welat” û her wiha “cefakar, wefakar, fedakar û her dem çavşil e.” Tenê ew digirîn!

Îtîraza min ji vê yekê re heye. Em ên ku me riya xwe ber bi stêrkan xistiye û hemû tiştên riziyayî, zordest û kufikî red kiriye; me çima di vê babetê de guhertinek çênekiriye? Herhal em nikarin bibêjin; “ji ber ku ev mesele pir pîroz e, bêqisûr e, mîraseke bêhempa ye, guhertin navê, tabû ye, qedexe ye” û hwd... Ger wiha bûya dê faşîstan jî heman nav û heman wateyê bidanayê? Na. Lew gelek caran faşîzm wek awêne ye; hezkirin, xwedîderketin, pîrozkirinên redkirin û lenetkirinê bi awayekî dijber, rastiyê radixin ber çavên me. Tişta ku ew jê hez nakin hêjayê hezkirinê ye, ya ku ew jê hez dikin jî mijara redkirinê ye. Loma jî ne mumkun e ku em ‘bigihîjin hev’ lê mixabin di mijara navborî de rewşeke wiha derdikeve holê.

Herçî ez, bi siûd im ku min di malbatê de dayikên çavşil û belengaz nedît. Diya min a ku niha li alemên din dijî jî tu car neket nav qefeseke wisa teng û perîşan. Jixwe wê em bi çîroka Gulnaza Mîrza Beg mezin kir. Di çîrokê de digot ku dema serê hevjînê wê, birayê wê û kurê wê bi bartiya xwe ya herdemî jêdikin û li ser tepsiyê nîşanî wê didin jî nagirî, naqîre. Dibêje: “Berxê nêr ji bo kêrê ye!” Bi serê pêlavê xwe îşaret dike dibêje; “Ev hevjînê min, ev birayê min û ev jî kurê min e” û rûdinê lingên xwe davêje ser hev û ji xizmetkarên xwe qehweyekê dixwaze.

Îcar em niha çawa silav nedin Gulnazê û fêm nekin ku di wê ‘qehweya wê’ de wateyên pir wêrek û cuda hene ango ‘qehwe’ tenê qehwe nîne. Mirov dikare têkçûna dagirkeran a li hemberî vê serberziyê jî texmîn bike ne wisa... Ji ber vê yekê dayikên me yên çavşil jî divê wê kirasê biqetînin û her çiqas êşa herî mezin a wan be jî xwe hepsê nava wê êşê, nava wê nasnameya ku wan “bênasname” dihêle, wekî kes tune dike nekin, vê ezbera ku her kesê û her tiştî bêzar dike xira bikin. Mînak; gere karibin bi wan destên xwe yên afirîner şahiyê jî biçînin û ne tenê cefakar û fedakar bin, carna kêfxweş jî bin, li dû bayê dilê xwe jî bikevin û vê giyana ku şibiyaye şîneke mezin biguherînin. Niha dîmenek hat ber çavên min, em li mêvaniyê ne û jin hemû li dora dengê Eyşe Şanê kom bûne. Ew jî “Heywax dayê” dibêje û her kes bi ser hev de digirî... Niha kî dikare bibêje ku dîmenên wiha jin, mêr û jiyana azad, pêşerojên azad bînin?

Belê, navandin pir girîng e û gotin û wate mirov hay jê nebe jî dibin bendîxane! De ka em lîsteya gotinen wiha derxin...





Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# Pirsgirêka ‘yekitiya neteweyî’

Wekî têgeha ‘netew’ têgeha ‘yekitî’yê jî ne peyveke jixweber derketî û temamkirî ye. ‘Yekitî’ya ku di çarçoveya vê nivîsê de beramberî ‘netew’ê tê bikaranîn, mijarê hîn tevlihevtir û neçaresertir dike.

Di nîqaşên aktuel ên der barê polîtîkayên kurdistanî de ev demek e mijara ‘yekitiya neteweyî’ mijareke sereke ye. Her hêz û rêxistin vê mijarê li gorî xwe û fêmkirina xwe şîrove dikin, dinirxînin. Pirî caran ev peyv bêyî zanîna wateya wê bi bingehîn a qada polîtîk û civakî tê bikaranîn; li gorî helwesta bîrdozî têgeh an tê redkirin, an jî hişk pê tê girtin. Û qasî ku li holê ye, tu formula çareseriyê jî nîne.

Di 4-5ê Îlonê de, li Holandayê konferanseke bi mebesta avakirina ‘yekitiya neteweyî’ hat lidarxistin. Ne hemû bin jî gelek partî û rêxistinên kurdistanî ku li dîasporayê rêxistinkirî ne û kesên serbixwe tev li vê konferansê bûn. Mijarên sereke dagirkirina Kurdistanê û pêdiviya helwesta hevkar li dijî dagirkeriyê bûn. Di konferansê de ji xeynî şîrove û analîzên siyasî ji gotinên Ehmedê Xanê bigirin, heta yên Cegerxwîn, ji qewlê êzidiyan bigirin heta yên elewiyan ên der barê tifaq û yekitiyê de hatin bilêvkirin. Wisa xuya ye ku qada siyaseta kurd ‘yekitiyê’ li dijî dagirkeriyê wek çareseriya sereke dibîne.

Ka em binêrin ‘yekitiya neteweyî’ kengî û bi çi awayî, li ser kîjan bingehê hatiye avakirin; gelo di wateya xwe ya dîrokî de çiqas dikare bibe bersiva dagirkeriyê; û gelo ‘yekitî’ di asta neteweyî de çawa dikare bê bikaranîn?

Peyva ‘yekitiya neteweyî’ jî wek gelek têgehên ‘modern’ bingeha xwe ji şoreşa fransî distîne. Bi avakirina ‘netewe’yê diviyabû taybetî û cudahiyên civakî, herêmî, dînî û çandî ya hemwelatiyên fransî jî li ser bingeheke nû ya ‘neteweke yekbûyî’ bihata avakirin. Û ev netew diviyabû wek civata navendî taybetiyên cudakirî derbas bikira û wek otorîteya tekane û hevkar biketa bin xizmeta berjewendiya neteweyê.  Lê wek tê zanîn di demeke kin de ‘yekitî’ ji ‘hevkari’ya ku dihat armanckirin derket. Lewre divîyabû ‘nirxên hevpar’ bên avakirin. Girêdayî vê ziman, al û sînorên neteweyî hatin pênasekirin. Û ji xwe çîroka piştî vê ji aliyê her kesî ve tê zanîn.

Lê ‘yekitî’ ne tenê ji bo civakên pirçandî û pirrengî pirsgirêk e. Ger em neteweyeke bi her awayî bi heman rengî, çandî, zimanî û hwd. bifikirin jî ev nayê wê wateyê ku ew netewe neteweyeke ‘yekbûyî’ ye. Lewre li wir jî berjewendiyên serdestî û bindestiyê dikevin dewrê. Gorî ku neteweyên bê nakokiyên çînî tune ne; em dikarin bibêjin ku ‘netewe’yên bi tifaq û yekitî jî tune ne. Her tim beşeke biçûk û elîtist a ji civakê xwe xwediyê neteweyê dibîne.

Sara Aktaş di nivîsa xwe ya der barê ‘yekitiya neteweyî’ de bi mafdar dibêje, tu pirsgirêka gelan a ‘yekitiyê’ nîne. Lewre gel –taybetî jî gelê kurd- li gel cudahiyên xwe yên çandî, zimanî, dînî di asta bingehîn de xwedî ruhê yekitiyê ne; bi gotineke din, gel bi tifaq in. Pirsgirêk di wê astê de ye ku partî û dezgehên siyasî li ser îdîaya berjewendiyên ‘neteweya kurd’ dikin. Û jixwe dema behsa ‘yekitiya neteweyî’ tê kirin, bi giştî ‘lihevkirin û lihevhatina partiyan, ên xwedî hêz’ tê qestkirin.

Nexwe têgihiştina civakê/gel û yê xwedî biryaran ji hev cuda ye. Gel ji ‘pevrebûn’ê wek kevneşopiyeke mirovahiyê ya dîrokî fêm dike; yên xwedî biryar li ser esasa kevneşopiya (şoreşa fransî) neteweyî ‘yekitî’yê digirin dest. Ya destpêkê me dibe pirdengiyê, ya duyemîn yekdengiyê.

Lewre jî mijara ‘yekitiya neteweyî’ ji hêlekê ve mijareke navxweyî ya ‘hêzên xwedî gotin’ e. Li gorî têkiliyên wan ên bi serdestiyê re teşe digire. Û ji ber vê yekê jî mijareke bîrdozî ye. Li hêla din mijareke derveyî ye jî. Girêdayîbûna wê ya dagirkeriyê jî di vê çarçovê de ye. Helwesta li hundir, sekna li dijî dagirkeriyê dide der. Ya li eniya serdestiyê dikeve rêzê, li hundir û li derve xwedî heman helwestî ye.

Di vê nivîsê de bersiv ji bo çareseriya ‘yekitiya neteweyî’ nîne, lê em dikarin ji serobinokirina têgehan dest pê bikin. Wan ji hev hilweşînin; wateya wan a ku ji hêla serdestan ve hatine çeprastkirin red bikin; bi naveroka wan a dîrokî û bingehîn ji nû ve ava bikin.

Ji me re çanda ‘pevrebûneke’ bi rêzdarî û exlaqî li ser pejirandina cudahiyê û wekheviyê divê. Ne ‘yekitiyeke’ li ser esasa ku dixwaze ji cudahiyê ‘neteweke yekbûyî’ ava bike.

## Li Silêmaniyê projeya çanda pirtûkxwendinê



Li Silêmaniyê Yekitiya Jinên Kurdistanê beriya du mehan projeya bi navê çanda pirtûkxwendinê dabûn destpêkirin. Her hefte jinên ciwan di roja diyarkirî de li hev kom dibin û li ser pirtûkekê nîqaşan dikin. Endama Projeya Çanda Pirtûkxwendinê û Rêvebera Pirtûkxaneya Tewareyê Sanya Kamil têkildarî projeyê axivî û ev agahî da: “Armanca me ew e ku ciwan pirtûkan bixwînin. Ji ber wê jî di nava hefteyê de em çend pirtûkan diyar dikin û piştre jî li ser pirtûkê nîqaşan dikin. Bi vê yekê em dixwazin ciwanên ku di asteke zêde de torên civakê û telefonê bi kar tînin kêmtir bikin û berê wan bidin pirtûkxwendinê û bibin hevalên pirtûkê.” ***SILÊMANÎ***

## Cilên rengîn ên jinên afgan bûn bersiv



Komek jinên afgan girêdayî tevgera Talîbanê ku niha li Afganistanê serdest e, bi armanca belavkirina fikra Talîbanê bi komek jinên Zanîngeha Kabulê re civiyabûn. Di wê civînê de jinên alîgerên Talîbanê cilên reş li xwe kiribûn ku heta çavê wan nexuyabûn, pesnê çanda îslama afganî kirin. Têkildarî vê mijarê jinên çalakvanên afganî wêneyên xwe yên bi cilên afganî yên rengîn li ser malperên medyaya dîjîtal parve kirin û bi vê yekê cilên Talîbanê ku li ser wan ferz kiriye, protesto kirin. Bi vê protestoyê jinên afgan ji Talîbanê re gotin ku ev cilên ku jinên alîgirên Talîbanê li xwe dikin ne çanda afganan e, cilên xweşik û rengîn ên xwe pê dixemilînin çanda afganî ye. ***KABUL***

## Li Moskovayê civîna li ser berxwedana jinan



Li paytexta Rûsya Moskovayê di çarçoveya projeya Mîrateya Çandî û Dîrokî ya Moskovayê de li ser mijara jinên ku welatê xwe parastin û diparêzin civînek hat lidarxistin. Di civînê de li gel nûner û berpirsiyarên sazî û rêxistinên jinan fermandarên artêşa Rûsyayê jî amade bûn. Di civînê de li ser navê jinên kurd ên li Rûsyayê rojnameger Kurdistan Lezgiyeva axivî û bal kişand ser rola jinên kurd ên di şerê dijî DAIŞ’ê de. Her wiha Lezgiyeva bal kişand ser girîngiya têkoşîna jinan û wiha got: “Êdî jin bi hişmendiyeke azad tevdigerin û dikarin xwedî li hebûna xwe derkevin. Di her qada jiyanê de jin xwe bi rêxistin dikin. Asta rêxistinbûyîn û têkoşîna jinan gihaştiye pir girîng e.” ***MOSKOVA***

# Ciwan û gel li dijî tiryakê bûn yek

Medya Bal

## Hêzên desthilatdar ji bo pergala xwe bidin mayîndekirin berê xwe didin ciwan û jinan. Bi rê û rêbazên şerê taybet û psîkolojîk ciwanan bi tiryak, fihûş û sîxûriyê bê vîn û îrade dikin



Li Tirkiyeyê hejmara kesên ku madeyên tiryakê dikişînin her ku diçe zêdetir dibe. Bi taybet li Kurdistanê hejmara tiryakkêşan gihiştiye asta herî jor. Temenê tiryakkêşiyê daketiye binê 12 saliyê. Meclisa Ciwanên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), li dijî zêdebûna tiryak û fihûşê ya di nava civakê de zêde dibe dest bi kampanyayê kirin. Meclisa Ciwanên HDP'ê di 10'ê îlonê de bi dirûşmeya 'Em xwe ji tiryakê rizgar bikin, jiyana nû ava bikin' dan destpêkirin. Ciwanan piştî startê li taxan dest bi xebatan kirin. Endama Lijneya Rêvebir a Ciwanan Gulistan Yilmaz, tekildarî xebatên xwe bi me re axivî.

Gulistan Yilmaz diyar kir ku di civakê de herî zêde jin û ciwan azadiyê dixwazin û wiha got: "Jin û ciwan bi ruhê azadîxwaz ji civakê re pêşengtiyê dikin. Ji ber vê yekê jî di xweparastin û ji nû ve avakirina civakê de xwediyê roleke girîng in. Li dijî desthilatdaran nasnameya civakî temsîl dikin. Desthilatdar jî ji bo ku hêza têkoşîn û berxwedanê kêm bike di serî de êrîşê ciwan û jinan dikin. Bi êrîşên fîzîkî, psîkolojîk, polîtîk, çandî û her awayî dixwazin vîna ciwanan bişikînin û şerê taybet berfirehtir bikin. Di şexsê ciwanan û jinan de ev êrîş li hemû civakê tê kirin. Dîsa di xurtkirin û rêxistinkirina gel de em ê rola xwe bileyîzin."

**'Em ê xwe bigîhînin hemû kesan'**

Gulistan Yilmaz têkildarî şerê taybet ê ku îktîdar li dijî civakê pêş dixe jî wiha axivî: "Bi polîtîkayên taybet dixwazin yekitiya civakê xira bikin û belav bikin. Ji ber vê yekê di nava civakê de tiryak, fihûş, sîxûrtiyê û tiştên wiha pêş dixin. Bi taybetî di salên dawî de bi kûrkirina şer, li Kurdistanê tiryak, fihûş û sîxurtî zêde bûye. Em jî wek ciwanan xwe li dijî vî şerî berpirsyar dibînin. Me li dijî van polîtîkayan dest bi kampanyayê kir. Bi pêngava 'Em xwe ji tiryakê rizgar bikin, jiyaneke nû ava bikin' em ê xwe bigihînin hemû ciwanan û civakê. Em ê xwe bigîhînin kesên tiryakkêş û ketine tora tiryakê. Ji bo wê em ê li kolan û taxan bixebitin. Em ê kesên ku bazirganiya tiryakê dikin, belav dikin û destûrê didin teşhîr û şiyar bikin. Em ê bi xebatên hunerî, çandî, sportîf ciwanan ji tiryakan dûr bixin."

Gulistan Yilmaz destnîşan kir ku ji ber polîtîkayên qirêj zêde li Amedê pêk tên pêşî li Amedê dest bi kampanyaya xwe dikin û wiha berdewam kir: "Bêguman em ê malbatan jî tev li xebatên xwe bikin. Ji ber ku yên herî zêde bi ciwanên tiryakkêş re eleqedar dibin malbatên wan bi xwe ne. Ji ber vê yekê tevlêbûna malbatan pir girîng e. Em ê xwe bigîhînin malbatan û bi wan re li dijî tiryakê têbikoşin."

**'Gel dibîne û dizane'**

Gulistan Yilmaz bal kişand ser nerazîbûnên gel ên li hember tiryakê û wiha lê zêde kir: "Gel di hişmediya van polîtîkayan de ye. Agahiya gel ji kesên belav dikin û destûr didin jî heye. Ji ber tiryak, fihûş û sîxurtiyê gel bêzar bûye. Me bi gelê xwe re bi kêfxweşî starta xebatê da destpêkirin. Piştgirî û daxwaziya gel di vê pêngavê de zêde ye."

Gulistan Yilmaz herî dawî bal kişand ser polîtîkayên îktîdarê yên amûra sporê û wiha got: "Bi sporê dixwazin enerjiya ciwanan pasîfîze bikin. Ciwanên ku li dijî kiryarên desthilatdaran bi hêrs dibin li şûna ku li dijî desthilatdaran îsyan bikin, bi rêya fanatîzmê enerjiya xwe xerc dikin. Feraseta fanatîzmê di mirovan de kesayetiya ezeztiyê, dijminatiyê, tundiyê jî diafirîne. Pergal, qada sporê ji bo xwe wek qadeke sereke dibîne. Lê em van nêzikatiya red dikin. Spor ji bo pêşvexistina tendirustiya laş û hişê mirov qadeke girîng e. Heke di bingeheke rast de spor pêş bikeve, qadeke girîng e."

# Hevkariya kontra û MÎT'ê ya li Silêmaniyê

Di rojên dawî de li Silêmaniyê 2 êrîşên çekdarî pêk hatin. Di êrîşan de kurdekî Bakur ê welatparêz hat kuştin û kurdek jî birîndar bû. Di 16'ê îlonê de welatiyê ji Bakur Ferhad Bariş Kondu hat gulebarankirin û birîndar bû. Di 17'ê îlonê de jî Endamê Komîteya Malbatên Şehîdan a PKK'ê Yasîn Bulut hat kuştin. Lê heta niha hêzên ewlekariyê, hikûmeta başûrê Kurdistanê têkildarî mijarê agahiyek nedaye. PDK'ê li hemberî van êrîşan hêj daxuyanî nedaye û bêdeng e.

Ferhad Bariş Kondu ku ji bakurê Kurdistanê ye niha li nexweşxaneyê tê dermankirin. Komeleya Karkerên Mezopotamyayê (KMK) jî têkildarî mijarê daxuyaniyek da û diyar kir ku hewldana kuştina Ferhad Bariş Kondu ji aliyê MÎT'ê ve pêk hatiye. KMK'ê bang li rayedaran kir ku bi lez êrîşkaran aşkera bike.

KMK'ê hewldana qetilkirina Ferhad Bariş Kondu yê ji bakurê Kurdistanê xiste stûyê MÎT'a dewleta tirk û got: "Demek e MÎT zextê li me dike û daxwazê ji endamê me dike ku ji bo wan kar bikin."

Mezopotamya Mûsa Xalid daxuyanî da û got: "Di 16'ê îlonê saet di 08.00'an de hevalê me Ferhad çû dikanê veke, di wê demê de kesek diçe dikanê û bi çekê êrîşê wî kir. Hevalê me Ferhad birîndar bû. Me serdana asayîş û polîsan kir. Bi awayekî asayî nêzî bûyerê dibin. Lê rasterast hewl dane hevalê me qetil bikin. Niha jî li nexweşxaneyê ye û tê dermankirin."

Yasîn Bulut jî ji ber pirsgirêkên tendirustiyê hatibû Silêmaniyê û li taxa Çarçira ji aliyê endamên MÎT'ê ve hat qetilkirin. Komîteya Pêwendiyên Derve ya PKK'ê der barê êrîşê de daxuyaniyek da û got: "Dewleta tirk hevalê me Yasîn Bulut (Şukrî Serhed) li ber mala ku lê dima, bi awayekî hovane qetil kiriye. Em banga xwedîderketina li Yasîn Bulut û helwestnîşanê dikin."

Cenazeyê Şukrî Serhed piştî ji saziya Tiba Edlî hat wergirtin bi dirûşmeyên "Şehîd namirin" birin mizgefta Ehmedê Hecî Elî. Ji gelek herêmên başûr bi hezaran kurd beşdarî merasîma şehîd Şukrî Serhed bûn û cenaze gihandin Goristana Şehîdan a Binarê Qendîlê. ***SILÊMANÎ***

# Pirtûkên kurdî li girtîgehan jî bivve ye

ÎHD û saziyên mafên mirovan bi rapor û daneyan piştrast dikin ku gelek mafên girtiyan tên binpêkirin. Mafê tendirustî, daxwazname, name, pirtûk telefon û gelek mafên din têne binpêkirin. Bi taybetî mafê girtiyan ên pirtûkên kurdî têne binpêkirin. Li gorî rapora Komîsyona Girtîgehan a Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a meha nîsan, gulan û hezîrana 2021'ê li girtîgehên Tirkiyeyê 287 hezar 94 kes girtî ne. Ji kesên girtî jê 11 hezar û 283 jin, hezar û 640 zarok û 274 hezar û 171 jê mêr in. Li girtîgehên Tirkiye û Kurdistanê, di meha nîsan, gulan û hezîranê de 17 girtî mirin. Komîsyon di raporê de destnîşan dike ku li gel girtî bi hejmarek zêde di nava hev de dijîn jî li gorî pêwistiyê paqijî nayê kirin. Ev jî dibe sedem ku şewba vîrûsa Covîd-19 bi lez belav bibe. Komîsyon destnîşan dike ku li girtîgehan 604 girtiyên nexweş ên rewşa wan giran hene û bi giştî hezar û 605 girtî nexweş in. Li gorî dane û rapora Navenda ÎHD'ê ya 2020'î li girtiyan 60 girtî mirin. ÎHD di rapora 2020'î de agahiyên 10 salên dawî jî parve kirin û ev agahî dan: "Li Tirkiyeyê di 2020'î de 60 girtî mirin. Ji ber agahiyên kêm em nikarin tam hejmara rast destnîşan bikin. Hejmara rast pir zêde ye. Li gorî bersiva Wezîrê Dadê Bekir Bozdag, di sala 2017'an de agahî dan parlamentere CHP'ê yê Sezgin Tanrıkulu; li girtîgehan di sala 2009'an de 242, di 2010'an de 260, di 2011'an de 285, di 2012'an de 286, di 2013'an de 265, di 2014'an de 312, di 2015'an de 373 girtî li girtîgehan mirin. Li gorî raporên ÎHD'ê jî di 2009'an de 36, di 2010'an de 35, di 2011'an de 36, di 2012'an de 73, di 2013'an de 33, di 2014'an de 45, di 2105'an de tevî daneyên Wezareta Dadê 227 girtî mirin. Komîsyona ÎHD'ê di rapora 3 mehên nîsan, gulan û hezîrana 2021'ê de bal kişandiye ser mafê tendirustî, ragihandinê yê girtiyan û cih daye van agahiyan: "Girtiyan bi maşîneyên rîngê û di şertên xerab de sewqî nexweşxaneyan dikin. Girtiyan tevî kelepçeyan muayene dikin. Li gel rîska vîrûsa Coronayê amûrên paqijiyê û rûpoşan nadin girtiyan. An girtiyên nexweş dereng dişînin revîran, an jî qet naşînin revîran. Girtiyên bi nexweşiya epîlepsî di hucreya yek kesî de têne girtin. Saziya Tipa Edlî tevî nexweşiyên giran rapora "Dikare li girtîgehê bimîne" dide girtiyan. Girtiyên nikarin pêdiviyên xwe pêk bînin serbest nayên berdan. Dermanên girtiyan ên daîmî nadin wan. Girtiyan tedawî nakin. Komîsyon diyar dike ku li girtîgehên Herêma Anatoliya Navîn di mehên nîsan, gulan û hezîranê de 30 girtî bi îşkenceyê re rû bi rû mane. Komîsyonê da zanîn ku li gel zirûfê ku girtî bi şert bên berdan heye jî bi sedema cezayê dîsîplînê li wan hatiye birîn girtî nayên berdan.

**Pirtûkên kurdî nadin girtiyan**

Rojnameyên Yenî Yaşam, Evrensel, Bîrgun, nadin girtiyan. Girtiyên dûrî malbatên xwe ne, dixwazin sewqî girtîgehên nêzîkî malbatan bêne kirin. Lê ev daxwazên girtiyan nayê qebûlkirin. Mafê girtiyan ên ragihandinê tê astengkirin. Pirtûkên kurdî nadin girtiyan. Daxwaznameyên girtiyan nayên bersivandin û daxwazname nakevin qeydên fermî. ***ENQERE***

## Dayikên Aştiyê Barzanî hişyar kir

Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Stenbolê li avahiya xwe ya li navçeya Fatîh a Stenbolê daxuyanî da û pankartên "Banga ji bo mirovatiyê û şer ji dayikan bipirsin!" daliqandin. Înîsiyatîfa Dayikan bertek nîşanî êrîşên Tirkiyeyê yên li ser Herêma Federe ya Kurdistanê da û banga "Nebe şirîkê şer" li Mesût Barzanî kir. Înîsiyatîfa Dayikan êrîşên Tirkiyeyê yên li ser Herêma Kurdistana Federe û bêdengiya hikûmeta herêmê ya li hember şer şermezar kirin. ***AMED***

## Lîstika polîsan a li dijî HDP'ê

Kesê bi navê Mehmet Laçîn li ber avahiya Rêxistina HDP'ê ya Îzmîrê bi îdiaya "HDP'ê zarokek wî biriye çiyê" bi piştgiriya polîsan nobet digirt. Polîsan Laçîn anî ber Navenda Giştî ya HDP'ê ya li Enqereyê û xwestin li ber avahiyê jê re kon vedin. Mehmet Laçîn bi fermana polîsan li ber Meclîsê û Dadgeha Destûra Bingehîn daxuyanî da û li ber avahiya HDP'ê xwest kon vede. Polîsan kuçeya navenda partiyê dorpêç kirin û Mehmet Laçîn anî ber Navenda Giştî ya HDP'ê da ku jê re kon vekin. Parlamenterên HDP'ê bi dirûşmeyên "Polîs kujeran diparêzin" û "Hûn nikarin kujerê Denîz Poyraz bînin" bertek nîşanî polîsan dan. ***ENQERE***

## Ozkan 28 sal in tê darizandin

Girtiyê nexweş ê 83 salî Mehmet Emîn Ozkan 28 sal berê li Licê, di encama kuştina Fermandarê Cendirmeyan ê Amedê Bahtiyar Aydin de hat girtin, hêj girtî tê darizandin. Leşkeran di 22'ê cotmeha 1993'an de li navenda navçeya Licê ya Amedê operasyon li dar xistibûn. Di operasyonê de Fermandarê Cendirmeyan ê Amedê Bahtiyar Aydin hatibû kuştin. Piştî bûyerê Mehmet Emîn Ozkan hatibû girtin. Ozkanê 83 salî niha hem girtiyê nexweş e û hem jî 28 sal in tê darizandin. Girtiyê nexweş Mehmet Emîn Ozkan dîsa hat darizandin û nehate berdan. Heyeta dadgehê biryara berdewama girtina Ozkan da û danişîn taloqî 21'ê kanûnê kir. ***AMED***

## Şandeya MSD'ê li Moskovayê bû

Li ser vexwendnameya fermî ji Rûsyayê şandeyeke MSD'ê û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi nûnerên Wezareta Derve ya Rûsyayê li Moskovayê civiyan. Nivîsgeha Ragihandin û Çapemeniyê ya Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) têkildarî serdana şandeyê ji Moskovayê re got: "Li ser vexwendnameyeke fermî ya Wezareta Karûbarên Derve ya Rûsyayê şandeyeke MSD'ê û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi serokatiya Îlham Ehmed bi nûnerên Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê bi serokatiya Mikhail Bekdanov re civiyaye."Şandeya MSD`ê par jî di serokatiya Meclisa Rêveber a MSD`ê Îlham Ehmed bi wezîrê karên derve Sergey Lavrov re di îlona par de civiyabû. ***AMED***

## ŞERÊ DERÛNIYÊ LI DIJÎ KURDAN TÊ KIRIN

# Divê her kes xwedî li girtiyan derkeve

Alî Bînen

*Li gorî rapor û daneyên ÎHD'ê li girtîgehên Tirkiye û bakurê Kurdistanê her ku diçe hejmara girtiyên nexweş zêde dibe û rexmî vê jî girtiyên nexweş nayên berdan. Li girtîgehan girtiyên nexweş ji ber ku nayên dermankirin û serbest nayên berdan yek bi yek jiyana xwe ji dest didin. Li gorî rapora Wezareta Edaletê ku ji bo budçeyê şand meclisê, Li gorî rapora Komîsyona Girtîgehan a Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a meha nîsan, gulan û hezîrana 2021'ê li girtîgehên Tirkiyeyê 287 hezar 94 kes girtî ne. Li gorî dane û raporên ÎHD 604 jê giran bi giştî hezar û 605 girtiyên nexweş li van girtîgehan in. Herî dawî girtiyê nexweş Abdulhalîm Kirtay ê ku ji sala 1993'yan ve girtiye û nexweşiyên giran lê peyda bûne, di hevdîtina telefonê de gotiye 'dibe ku hûn agahiya mirina min bigirin.' Têkildarî rewşa dawî ya Abdulhalîm Kirtay em bi keçа wî Herdem Merwanî re axivîn.*

*Keça Abdulhalîm Kirtay Herdem Merwanî der barê rewşa girtiyên nexweş de axivî û diyar kir ku ji ber ku siyasî ne, weke dîlên şer li wan dinêrin û ku berdana wan jî nêzik dibe dixwazin weke amûreke şerê derûniyê li ser me bidin meşandin û li hemberî civakê bi kar bînin*

**Rewşa girtiyên nexweş demeke dirêj e di rojevê de ye. Li gorî raporên ATK'ê divê girtiyên nexweş bên berdan lê nayên berdan. Abdulhalîm Kirtay jî yek ji wan e, ango bavê te. Tu ji bo van rewşan dikarî çi bibêjî?**

Bavê min 29 sal in di zindanê de ye. Jixwe pir hindik maye, salek jî nemaye. Ji ber ku siyasî ne, weke dîlên şer li wan dinêrin û ku berdana wan jî nêzik dibe dixwazin weke amûreke şerê derûniyê ser me bidin meşandin û li hemberî civakê bi kar bînin. Naxwazin ku bi saxî bikevin nava civakê. Yan dixwazin cenazeyê wan ji me re bişînin yan jî dixwazin bikin nîvmirov û wisa bişînin. Ji ber vê bedel çi dibe bila bibe em vê yekê qebûl nakin. Ev zilm tenê li girtiyan nayê kirin, li ser malbatên girtiyan jî tê kirin. Mînak tiştên ku tenê di rojekê de bi me dan jiyîn tiştên ne ji rêzê û normal in. Di rojekê de serê sibê heta êvarê di navbera nexweşxane, emniyet, cendirme û zindanê de çûyîn û hatin tiştên ne normal e, ne tiştên ku bêne qebûlkirin e. Yanî hinek tişt hene tenê hêviya malbat û çapemeniyê ve tên hiştin ez vê jî rast nabînim. Di vir de kar dikeve ser milê her kesî. Karê ku dikeve ser milê siyasetmedaran heye, dikeve ser milê hiqûqnasan û doxtoran heye. Ango li ser her saziyan heye. Mînak ez bibêjim saziyên me yên ku herî zêde xwe jê dûr digirin saziyên ziman in. Ew sazî jî wekî hemû kurdan dikarin xwedî lê derkevin. Ji ber ku zimanê kurdî jî bê kurd nabe. Ji ber vê yekê jî ger ku kurdekî di bin xetereyê de be, saziyên ku herî zêde dûrî van tiştan bê dîtin jî divê bêdeng nemînin. Ji ber vê jî banga min ji her kesî re heye, ji biçûkan bigire heya mezinan, ji saziyan heya şexsan divê dengê me bibihîsin. Ez li hemberî vê gotinê me jî; 'Bêdengî mirov dikuje.' Yanî em bi hezaran in, bi milyonan in çima bêdengî dikuje? Ê wisa be em tev berpirsyar in. Em bêdeng in ku bêdengî dikuje. Lê her kes ji me ku bi wijdanê xwe biaxive wê çaxê dê bêdengî me nekuje. Di dema dawî de ji ber ku cezayê wî hindik maye êdî vê tedawiyê jî wek amûreke îşkenceyê bi kar tînin.

Beriya her tiştî divê hinek tişt tenê li ser malbatê neyê hiştin. Yanî wekî malbatekê em qet tiştekî nikaribin bikin jî em ê dengê xwe li hemû cîhanê bidin bihîstin. Em nasekinin, em ê li kêleka wan bin. Ji ber ku em vê wekî rûmet û wijdan dibînin. Em ê li kêleka wan bin, wan bi tenê nehêlin. Lê raya giştî divê hestiyar be. Her kes dikare tiştekî bike. Hinek tişt hene bi hiqûqê xelas dibe, lê em wekî malbat nikarin van karan bikin. Hinek tişt jî hene bi siyasetê xelas dibin, hiqûq nikare bike. Ji ber vê tiştê ku em di vê demê de ji raya giştî dixwazin ne tenê ji bo bavê min, ji bo hemû girtiyên nexweş û temenmezin ku gelek bi nexweşiyên giran re rû bi rû mane hestiyariyek çêbibe. Vê demê em dibêjin bila her kes li kêleka me be û ez bi awayekî zelal dibêjim ên ku di vê rewşê de ne li kêleka me bin û heke tiştek qewimî, tiştek bi serê wan hat şûnve bila êdî kes neyê ser cenazeyê me û bila kes sloganan jî neavêje. Ji bo me û ji bo hinek kesan dibe ku ev rewş tiştekî pir hêsan be lê belê ev ji bo zarokên wan, malbata wan tiştekî ne hêsan e. Mînak ez difikirim ku bavê min li nexweşxaneyê di bin siya leşkeran de, kelepçe di destên wî de tedawî dibine, ev jixwe ji bo me qiyamet e. Ji bo vê jî divê hinekî ji me fêm bikin. Ne ku em vala ne û em dixwazin ji xwe re rojevekê ava bikin, rastiyek heye û em dixwazin li pey vê rastiyê herin, em li ser vê rastiyê bisekinin û bila raya giştî jî dengê wijdanê xwe guhdar bikin û li kêleka me bin. Bi rastî jî yên ku îro ne li kêleka me bin sibê em wan li kêleka xwe qebûl nakin. Ez vê jî wekî bertekeke malbatê û ser navê hemû malbatên girtiyan dibêjim. Kî li ba me be bila îro li ba me be.

> Ez li hemberî vê gotinê me ku dibêjin; 'Bêdengî mirov dikuje.' Em bi hezaran in, bi milyonan in çima bêdengî bikuje? Ê wisa be em tev berpirsyar in. Em bêdeng in ku bêdengî dikuje. Heke her kes bi wijdanê xwe biaxive wê çaxê dê bêdengî nekuje

**Abdulhalîm Kirtay di hevdîtina telefonê de gotiye ku 'dibe ku hûn agahiya mirina min bibihîzin.' Rewşa tendirustiya wî çi ye, çi nexweşiyên wî hene?**

Ji bo niha ez di der barê tenduristiya bavê xwe de, di her milî de biguman nêz dibim. Ez tenê dikarim bibêjim ku rewşa bavê min ne baş e û heta niha me tu agahiyeke zelal bi dest nexistiye. Ji wan agahî girtin jî weke amûreke îşkenceyê li hember me tê bikaranîn. Hefteyek e tu agahiyên zelal bi me re parve nekirine. Ez tenê dizanim ku rewşa bavê min pir xerab e û bi rastî jî ew dixwazin zêdetir xerab bibe.

Mînak vê hefteya ku derbas bû ji xwe roja telefona bavê min bû. Di telefonê de ji me re ev tişt got: "Rewşa min nebaş e, ev du roj in ez di hucreyê de me, li ser min tundî heye, dibe ku hûn agahiya mirina min bigirin û ji bo her tiştî amade bin." Piştî vê gotinê wisa dengê reqîna telefonê û dengê wî hat, kir axînî û pê re telefon hat girtin. Piştî vê em tim li zindanê geriyan, tu tiştek ji me re negotin. Tenê gotin ku tiştek wî tune ye. Jixwe beriya ku were ser telefonê jî geh digotin ne li vir e geh digotin nikare were û her carê tiştekî digotin. Êdî bi zorê, ku em pir li ser hev geriyan neçar man ku wî bînin ser telefonê. Piştî ev telefon ji destê wî ket êdî wî neanîn. Êdî ku em li zindanê digeriyan digotin li nexweşxaneyê ye, em li nexweşxaneyê digeriyan digotin ne li vir e. Welhasil piştre me parlementer û parêzeran kir navberê tu agahî nedan wan jî. Ji bo wan jî pirsgirêk derxistin. Bi hinceta pandemî heye nedihiştin hevdîtin pêk werin.

**Hevdîtinên te û parêzeran pê re çêdibe an na? Agahiyên nû li ber destê te hebin tu dikarî bi me re parve bikî?**

Jixwe li girtîgehên ji me dûr tên girtin. Em nikarin herin. Malbatên ku nêzî wan hebin ew diçin. Ji ber ku nexweş in jî dibêjin li nexweşxaneyan in û em nikarin hevdîtinan pêk bînin. Parêzer diçin ew jî ji ber vîrusa Covit-19 nikarin hevdîtin bikin. Vaye hefteyek e em li ser disekinin tenê bi qasî pênc deqîqeyan hevdîtin pêk hat. Ew jî ji dûr ve wî dîtiye, pê re axiviye. Ji vê şûn ve jî heta niha tu hevdîtineke me pê re çênebûye. Yanî ev korona jî bi serê xwe bû amûreke îşkenceyê.

Herî dawiyê soz dan gotin roja




duşemê wê hevdîtinekê rû bi rû çêbibe. Em tev roja duşemê li benda hevdîtinê bûn. Em çûn zindanê, gotin li nexweşxaneyê ye. Li nexweşxaneyê jî gotin li emniyetê ye, li emniyetê jî gotin herin cem cendirmeyê. Yanî girtiyekî ku tu eleqeya wî bi emniyet û cendirmeyê tune ye. Dema ku ev tişt hatin kirin êdî em gihîştin wê fikrê ku me got bavê min şehîd ketiye û ew dixwazin me hêdî hêdî hîn bikin û dê dû re agahî bidin me. Herî dawî ji me re gotin tiştekî em bikin tune ye, rewş ev e, ji her tiştî re amade bin. Dû re saet di pêncan de parêzer diçe bi qasî pênc deqîqeyan hevdîtin pêk tîne û em pê hesiyan ku bi roj li nexweşxaneyê dimîne, bi şev jî dibin li revîrê digirin. Parêzer got ku rewşa wî nebaş e, bi zorê diaxivî, ji ber wê me zêde pirs jê nekirin, tenê îşkence lê bûye nebûye me jê pirsiye, wî gotiye ku îşkence nehatiye kirin.

**Nexweşiyên wî yên kronîk û giran hene û demeke dirêj e girtiye. Divê li gorî van şertan di girtîgehê de nemîne. Çima nayê berdan û ji bo ku bê berdan heta niha te û parêzerên wî çi kir û ji bo berdana wî pêwîst e çi bê kirin?**

Xebatkarên nexweşxaneyê jî li gorî ku dibêjin nexweşekî giran e, divê yek rojekê jî di girtîgehê de nemîne. Divê rojek beriya rojekê ev nexweş derkeve û li derve tedawiya wî bê kirin. Li hemberî vê rewşê divê rapor di destê me de hebin. Lê heta niha me tu rapor negirtiye. Îro du roj in dibêjin hûn ê rapor bigirin lê heta niha tu rapor negihiştine ber destên me.

Nexweşiya şekir û tansiyonê bi bavê min re heye lê li gor vê rewşa dawiyê em dizanin tenê ev nexweşî nînin nexweşiyên cuda jî lê peyda bûne. Bavê min bi xwe jî digot ku ewqasî girtiyên nexweş ên giran hene, wî bi xwe jî nedixwest ku em wî bikin rojevê. Bi rastî em weke malbat jî di heman fikrê de ne. Ger ku bikevin rojevê bila tev bi hev re bikevin rojevê. Yanî di vê demê ez jî naxwazim tenê bavê min bikin rojevê. Ji ber ku bi hezaran kesên wekî bavê min hene û bi vê jî wijdanê me rehet nabe. Ji ber vê jî bila hemû girtiyên nexweş bibin rojev. Ez îro tenê ji bo bavê xwe bang nakim, nabêjim tenê bavê min berdin an jî bikin rojevê. Ger ku rojevek hebe bila tev bi hev re di rojevê de bin. Em cudatiyê naxwazin, yanî em weke malbatekî cudatiyê naxin navbera girtiyên nexweş. Nizanim nexweşiya filankes hindik e zêde ye, nexweşî nexweşî ye. Êdî ku giran bû pêve wateya berdanê namîne, wateya wê tedawiyê namîne. Me bi xwe dît yanî, berdan û şûnve hefteyek neqediya şehîd ketin. Ji ber vê yekê em bikin em tev bi hev re bikin rojevê. Bi rastî bi tenê, weke mirovekê wijdanê min jî qebûl nake. Tiştê ku ez dixwazim bila herkes li peywirên xwe xwedî derkevin. Ez vê gotinê jî dubare dikim, em ne mirovên vala ne û li cihê xwe rûnanên û ji xwe re jî rojevan ava nakin. Ji bo vê jî divê ev mijar di rojeva her kurdî de be û her yek ji me ku karê ku dikeve ser milên me heye. Hiqûq e, siyaset e, malbat in, mirovên demokrat in yanî mirovên xwedî wijdan divê xwedî li girtiyên nexweş derkevin.

### Abdulhalîm Kirtay kî ye?



Abdulhalîm Kirtay li navçeya Farqîna ya Amedê ji dayik bûye. Ji sala 1993'yan heta niha di girtîgehê de ye. Niha li girtîgeha Şakrana Îzmîrê tê girtin. Beriya wî jî li gelek girtîgehan maye. Wekî zindanên li Batman, Yozgat, Wan û hwd. li gelek zindanên cuda maye. Berî vê li Bûrhaniyê dima. Lê ji ber nexweşiyê ev sê çar sal in li Şakranê dimîne. Di dema dawî de nexweşiya wî pir dijwar bûye û ew jî wekî gelek girtiyên nexweş baş nayê dermankirin.

# 'Dengê Zê' şahidê êş û lehengiyê ye

Alî Bînen

**Helbestvanek, wêjevanek û romannûsek xwe di kîjan astê de bibîne nebîne ne muhîm e. Ya girîng ew e ku xwendevan û şopîner wî çawa dibînin û çiqasî berhema wî/wê diecibînin**



Roja 14'ê îlona 2021'ê li Pirtûkxaneya Lîlavê ya li navçeya Yenîşehîr a Amedê Roja Îmzeya Pirtûka Mehmet Akdogan a bi navê 'Dengê Zê' hat lidarxistin. Roja îmzeyê gelek nivîskar, wêjevan û xwendevanên kurdî li Pirtûkxaneya Lîlavê amade bûn û eleqeyeke xurt ji bo pirtûka Mehmet Akdogan a bi navê 'Dengê Zê' hat nîşandan.

Berî destpêkirina avêtina îmzeyan Mehmet Akdogan derket pêşberî girseyê û bi kurtasî behsa naveroka pirtûka 'Dengê Zê' kir. Akdogan diyar kir ku pirtûka 'Dengê Zê' şahida gelek bûyer, êş, zilm û tundiya li ser gelekî ye û destan û lehengiyên bêhempa jî di nav xwe de dihewîne.

Têkildarî Roja Îmzeyê û pirtûka 'Dengê Zê'yê em bi nivîskar Mehmet Akdogan re axivîn.

**'Helbest di zarokatiya min de hebû'**

Mehmet Akdogan di destpêka axaftina xwe de da xuyakirin ku wî di zarokatiya xwe de ji helbestan hez kiriye û dest bi nivîsandina helbestan kiriye û wiha axivî: "Helbest di zarokatiya min de hebû, min di medreseyê de xwendibû. Dema ciwaniya me demeke hestiyar bû. Şerekî giran nû dest pê kiribû û ciwan nû diketin nav û li her derê berdêl dihatin dayîn. Bi vê re hest bi me re derketin pêş. Hem ên lehengiyê hem jî yên xemgîniyê. Ji ber vê pêşî wekî dengbêjiyê min dest bi helbestan kir. Min li Geverê dema hîn 16-17 salî bûm dest bi nivîsandina helbestan kir. Heta niha min sê pirtûkên helbest dudu jî roman nivisandine."

**Çem û dengekî kolektîf**

Mehmet Akdogan der barê naveroka pirtûka 'Dengê Zê'yê de û li ser peyva 'Zê'yê axivî û wiha got: "Peyva 'Zê' ji Çemê Zapê tê û navê wî yê din jî 'Zê' ye. Newalek heye, jê re dibêjin Newala Zê. Wekî Newala Zapê jî tê zanîn. Çeqek wî ji Geverê yek jî ji Elbakê dest pê dike heya ku ji başûrê Kurdistanê derkeve jî li herêmên kurdan navê wê Zê ye. Herêmeke ku navê xwe ji zayînê digire. Di salên 1990'î de hemû kiryar li wê Newala Zê hatin kirin. Gundên cerdevanan li wir dan avakirin. Cînayetên kujerên wan nediyar li herêmê pêk dihatin û piştre wan dibirin herêmên cuda û winda dikirin. Ji ber vê 'Dengê Zê' şahida van hemû bûyeran e û di heman demê de şahida lehengiyê ye jî. Kesên ku li ber xwe dan û bi canbexşane xwe dan pêş, hemû di bin 'Dengê Zê' de ne. Yeke din jî avên wê herêmê hemû berê xwe didin Newala Zê. Yanî wekî çemekî kolektîf e, dengekî kolektîf e. Hem lîlandin e hem hewar e hem jî tilîlî ye. Ji ber vê yekê roman piranî li ber dengê Zê bi şev û roj şahida newala xwe bû, niha jî wisa ye. Niha jî şerê herî giran li ser Newala Zê ye.

**Êrîşên ser xeyalên zarokan**

Dengê Zê di heman demê de çîroka du zarokan e. Du zarok diçin medreseyê, dixwazin ku bibin mele û hêviyên dê û bavê xwe pêk bînin. Lê belê dema salên 90'î Hizbullah, JÎTEM û tarîqat hatin ser Îmam Xatîp û medreseyan û ew ev her du zarok dibine tetikkêş. Bûyer li herêma Colemêrgê dest pê dike û li Geverê bi dawî dibe. Lê her çiqas ew bajar vê îxanetê dibîne jî di nav wan de tolek jî heye. Ew tol jî di dawiya romanê de derdikeve. Ev hayjixwebûn e. Lê heya dawiya romanê jî dernakeve holê. Tecawiza zarokên di mederese û terîqetan de tecawiza jinan, îşkence, tehde û lêdana li ser gel hemû di nav de û berxwedana gelê herêmê jî ji serî heta binî di romanê de derbas dibe. Erdnîgariya herêmê Berçelan, Çemê Qerqemasê, Medreseya Meydanê, Newala Zê, Çiyayê Reşko, Deşta Geverê, hemû Çemê Kevirê Şine û gundên wan hemû li ser romanê hatine hûnandin. Roman ji destpêkê heta ku bi dawî dibe behsa gûzan û xeyalên zarokan dike ka zarokan çawa xeyalên xwe parastine, ev pergala nû çawa êrîşê xeyalên wan zarokan kiriye. Ji serî heya binî melayê Bateyî bi her rengî di nav romanê de ye."

**'Pirtûkên kurdî kêm tên xwendin'**

Akdogan di berdewamiya axaftina bal kişand ser asta eleqe, hezkirin û xwendina pirtûk û berhemên kurdî û wiha pê de çû: "Ez dikarim bibêjim ku pirtûka 'Bayê Cîlo' eleqeyeke baş dît. Hezar heb hatibûn çapkirin, niha jî nemaye û divê dîsa bê çapkirin. Bi pirtûka 'Bayê Cîlo' piçekî nasîna min a vê pirtûkê jî derkete pêş. Ji aliyê xwendevanên kurd ve, li gor şert û mercên demê kêm zêde eleqeyeke baş derkete pêş. Lê ne li gorî pîvanên kurdewariyê ye ku em bibêjin wekî romanên tirkî tên xwendin. Hê nagihîne ji sedî pêncê wê jî. Mixabin ev pirsgirêkeke cuda ye. Dema 'Bayê Cîlo' jî roja imzeyê hat lidarxistin. Fuar hebû, ango baş bû. 'Dengê Zê' jî jixwe berî 15 rojan hat çapkirin. Ev îmzeya min a yekem bû. Yanî li gorî van rojên dawî yên imzeyên nivîskarên kurd ne xerab bû, hevalên me yên ku li vir dixebitin jî vê dibêjin. Lê xwezî hîn baştir bûya û bêhtir bihata xwendin. Xema min ne ew e ku gelek hatin firotin an jî wê bên firotin. Gelo yên dikirin jî wê bixwînin an nexwînin. Ev pirsgirêkeke mezin e. Ji ber vê yekê divê pîvana me ew be ku gelo tê xwendin an nayê xwendin."

**'Helbestên amade hene'**

Akdogan der heqê xebat û projeyên xwe yên nivîs û nivîskariyê de ev agahî dan: "Di nav van 4 salên dawiyê de min du helbestên kurdî û du romanên kurdî nivisîn. Helbestên min têra dîwanekê amade ne. Lê ez dibêjim bila salek du sal derbas bibe. Yanî ez heya salek du salan bawer nakim tiştek çap bikim. Paşê ez ê dest bi nivîsandina romaneke din jî bikim. Lê gelek tişt hene ku ez binivîsînim. Ji yekî dipirsin dibêjin 'helbestên te yên herî baş ev in', ew kes jî dibêje 'na helbestên min ên herî baş ew in ku min ew hê nenivisîne.' Êdî em ê binivisînin, kî dixwîne bila bixwîne nehat xwendin jî bila li şûna xwe bimîne."

**'Ziman nebe tevger bi ser nakeve'**

Akdogan di dawiya axaftina xwe de daxwaz kir ku hemû kurd xwedî li zimanê kurdî û berhemên kurdî derkevin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Daxwaza min ji hemû kurdan, siyasetmedar, mamoste, ciwan, xwendevan û keçên kurd ew e ku bila xwedî li berhemên kurdî û zimanê kurdî derkevin. Ji ber ku hemû berdêlên giran ji bo kurdî û kurdayetî hatiye dayîn. Ger ku ziman nebe tu tevger bi ser nakeve û tu wateya wê jî nîne."

# Xeyala Min

Sayîme Xakpûr

Wê çaxê xeyalên min ji temenê min mezintir bûn. Min dixwast ez jî mezin bim û bibim endazyar û dibistanekê ji zarokên keç ên kurd re ku derfeta xwendinê ji wan re çênedibû ava bikim ku bikaribin hînî xwendinê û nivîsandinê bibin. Ez tekane keça kurd li bajarokê Nûşînşehrê yê bi ser bajarê Ûrmiyeyê bûm ku malbata min rê dida zarokên xwe yên keç ku biçin dibistanê û tevî zarokên fars, ecem, ermenî û asûrî xwendin û nivîsandinê hîn bibin. Ez jî hêla xwendinê ji hemû hevdibistaniyên xwe jîrtir bûm. Wan jî dexesiya min dikirin û digotin:

"Ha îro sibe wê malbata te jî rê li ber xwendina te bigire, tu jî mîna hemû keçên kurd ên li bajarokê me di malê de bi kar û barê malê re mijûl bibî. Vêca çima ewqas serê xwe bi xwendinê ve diêşînî?!. Lê min gotinên wan nedidanîn ser bendik û ez bi xeyala xwe re mijûl bûm. Ji ber ku xeyala min daxwaza min a herî mezin bû. Bi wê xeyalê re ez mezin bûm û xeyala min jî li gel min mezintir bû.

Sala dawî ya qedandina dibistana bilind bû û ez di beşa endazyariyê de bi ser ketim û derbasî zanîngehê bûm. Bi dilekî germ û tijî hêvî min dest bi xwendina zanîngehê kir ta ku min xwendina xwe di beşa endazyariyê de qedand û ez bûm endazyareke naskirî û serkeftî. Êdî dema pêkanîna xeyala min bû. Xeyala ku hemû xewnên min dagir kiribû û rê nedida ji bilî wê tiştekî din bifikirim. Di wê navberê de ez bi hevzanîngehiyê xwe, Harûn re bûme hevnas û hevaltiyeke me ya pir xweş û şêrîn hebû. Tişta zêde em bi hev re nêzîk dikirin ramanên me yên hevbeş bûn. Ew jî kurd bû û ji bo ku bikaribe xizmetekê ji gelê xwe re bike, beşa xwendina xwe endazyarî hilbijartibû û pir jî dilsojê gelê xwe bû. Harûn her tim ji min re digot: "Zozan em ê bi hev re bikaribin karên mezin ji bo gelê xwe bikin, em her du jî endazyar in û derfeteke baş e û divê em baş bi cih bînin."

Me bi hev re biryar da em projeyekê ji Saziya Avakirina Dibistanan daxwaz bikin. Me daxwaza xwe radestî Saziya Avakirina Dibistanan kir û wan jî piştî demekê daxwaza projeya me pejirandin û me li bajarokê Nûşînşehrê li erdekî vala û şînkatî de dest bi avakirina dibistana xeyala xwe kir. Her roj em diçûn serdana projeya xwe û bi coşeke mezin me karê avakirina dibistanê bi rê ve dibir. Dem û dewran wekî ava çeman diherikî û diçû, roj bi roj projeya me avatir dibû û em jî geştir û dilxweştir dibûn. Lê tişta ku me her duyan ji bîr kiribû, germahî û heza ku ketibû dilên me her duyan bû. Lê me derfet nedidît ji hev re aşkera bikin. Sedema wê yekê jî mijûliya me ya bêsînor ji bo daxwaza me bû. Her ku projeya me diçû serî, em zêdetir nêzî hev dibûn û evîna veşartî ya ku me di hundirê xwe de bi salan bêdeng kiribû û nedihişt serî hilde, gurtir û geştir dibû. Harûn mirovekî hêmin û bisebir bû û di karên xwe de tu carî lez û ecele nedikir. Hema hema ew rewişt û xûyê me her duyan jî mîna hev bû. Ez jî miroveke ser hemdê xwe û aram im. Jixwe her tim Harûn ji min re digot:

"Zozan ez wê sebr û tehemula xwe deyndarê te me, ez li cem te ji bilî gelek tiştan, sebirkirinê û bihêvîmanê zêdetir hîn bûm."

Êdî hevaltî û dostanî û hevkariya me cihê xwe dabû evînek bêsînor. Ez li bendê bûm Harûn gilî û gazinên dilê xwe veke ta ku agir û şewata dilê me hênik bike, lê nizanim çima bêdengî li cem wî hakim bû. Wê bêdengiyê rê nedida ez jî kela dilê xwe ji wî re bibêjim û aram bibim. Piştî du salan projeya me qediya me rojek ji bo vekirina dibistanê diyar kir û gişt dost û hevalên xwe vexwendin cihê dibistanê. Şeva ku biryar bû sibeha wê xewn û xeyala min ya zarokatî pêk bê, Harûn ji min re telefon kir û got, ez ê serê sibehê berî te biçim dibistanê tu dikarî hinekî derengtir werî. Û got: "Zozan, sibê xeberek min ê pir xweş ji te re heye. Demeke dirêj e hewl didim ji te re bibêjim lê derfet çênedibû, ma ji sibê çêtir û minasibtir gelo rojek heye ku nebêjim?! Piştî wê gotina Harûn per û baskên min hebûna ez ê heta serê çiyayê Dalamper û Kotolê bifiriyama û min ê kêfxweşiya xwe li ser bilindahiya wan çiyayan bi dengekî bilind bikira qêrîn da ku dengê min li deşta Somabiradostê û Silîvanayê olan bida her derê.

Tevî ku Harûn ji min re gotibû hinekî dereng were, lê ez berî her kesî li cihê dibistanê amade bûm. Demjimêr 8:30'ê serê sibehê bû min dît Harûn bi dengekî geş û xweş got:

"Roj baş Zozan!"

Ez zivirîm bersiva wî bidim, waa çi dibînim! Belê wê rojê Harûn bi hevala xwe re ku hevala me ya hevbeş jî bû, soz û peymana zewacê dabûn hev û dixwastin wê xeberê ango kêfxweşiya xwe li gel min û dost û hevalan dabeş bikin.

Erêê, wê rojê xeyala min a zarokatî pêk hatibû lê xewn û xeyalên gencaniya min hilweşiya û binax bû. Piştî wê têkçûna bêdeng û sêwî, min soz da hetahetayê wê evîna bêxwedî di dilê xwe yê lerzok de veşartî bihêlim.

## Apê Mûsa û gundê Stilîlê



Seyidxan Anter

Bê çawa Medreseya Sor û Birca Belek bêyî Melayê Cizîrî û Melayê Cizîrî jî bêyî Cizîra Botan çênabe, çaxa mirov behsa Stilîlê bike Mûsa Anter tê bîra mirov û dema mirov qala Mûsa Anter bike, bêyî Stilîlê nabe. Helbet bajarê Cizîrê û gundê Stilîlê du warên cuda ne. Her wiha Melayê Cizîrî û Mûsa Anter... Melayê Cizîrî yê di koşk û bircên girgirek ên mîrê Botan de û Mûsa Anter ê li nav erdê xwe bi zarok, xort û xelkê re...

Ya rastî çaxa min pirtûka Amed Tigrîs ya bi navê "Dîcle û Ferat" xwend û li helbesta li ser Stilîlê ya helbestvan "Baz" guhdarî kir, nêta nivîsandina li ser Stilîlê li cem min gurtir bû.

Girêdana di navbera Apê Mûsa û gundê Stilîlê de hulqasî bi hêz e ku berî kuştina xwe ne li gundê ku lê hatibû dinê, ango Zivingê li nav erdê xwe yê li Stilîlê cihê gora xwe destnîşan kiribû. Her wiha wê girêdanê rê dabû hin rojname û rojnamevanan ku tûşî hin şaşiyan bibin. Li gor wan Mûsa Anter li Stilîlê hatiye dinê. Naxêr Mûsa Anter li Zivingê çêbûye û wek ew di "Bîranînên Min" (Hatiralarim) de dibêje ji Zivinga Temikan e.

Ji Apê Mûsa pirsîne ka Stilîlê ji bo wî çiye? Bersivên wî balkêş in: "Lawo çaxa bohtî û stilîlî (diştaxilin) dipeyivin dengê wan wek muzîkê ye."

Carekê min bi xwe jê pirsî: "Apo ma ev mesela te û Stilîlê çiye?"

Apê Mûsa wiha bersiv da û got:


"Lawo hûn xort in, derdikevin seyranan, diçin tiyatro û sînemayan û kitêban dixwînin. Ê min jî li nav tirkan şarja min vala dibe, ez têm Stilîlê û ji nû ve dadigirim."

Li Stilîlê her tişt tê gotin û nivîsandin lê çi kes gotinê nagire ser xwe. Ev xala hanê rê li henek û laqirdiyan vedike û bi ser gij zahmetiyên civakî û siyasî de, jiyanê hêsantir, xweştir û dewlemendtir dike.

Ez zivingî me lê min dil heye ji rojnameya Xwebûnê re çend nivîsan li ser Stilîlê binivîsim. Li ser Mûsa Anter gelek hate gotin û nivîsandin. Îsal jî bo sedsaliya Apê Mûsa, bi tirkî pitûkek jî çap bû. Kitêbek mîna "Girara Qereçiyan".

Di der barê Stilîlê de çavkaniyên nivîskî yê li ber destan kêm in. Nivîsên min yên li ser Stilîlê bêhtir pişta xwe didin sohbet û hevpeyvînên bi stilîliyan re. Stilîlê, ji gelek aliyên xwe ve ji gundên dora xwe cudatir û rengîntir e. Bi ser hemû taybetmendiyên xwe ve Stilîlê minyatorek Kurdistanê ye, "bûka xemilandî", Stilîla Apê Mûsa.

Kêm hatiye gotin, ne zêde!



# 29 sal in edalet tune ye

Di ser kuştina Musa Anter re 29 sal borîn. Lê heta niha digel ku diyar in jî kujerên Musa Anter nehatin darizandin. Kurê Musa Anter Dîcle Anter, diyar kir ku avahiyên dadê hene, lê dad tune ye û got: "Em dibêjin 'Berxwedan Jiyan e' Em ê heta dawî li pey dozê bin

Zeynel Bulut

Rewşenbîr, zana, nivîskar, rojnameger û rûspiyê kurd Mûsa Anter (Apê Mûsa) di 20'ê Îlona 1992'yan de ji aliyê hêzên tarî û paşverû yên li Tirkiyeyê ve hat qetilkirin. Di ser qetilkirina Anter re 29 sal borîn, lê hêj kujer nehatine darizandin

Mûsa Anter li gundê Zivingê ji dayik bû. Li ber destên dayika xwe Fesla Xanim mezin bû. Fesla Xanim di navbera salên 1930-1940'î de muxtara gund bû. Muxtara pêşîn a jin a bakurê Kurdistanê bû. Apê Mûsa dibistana seretayî li Nisêbînê û ya navîn li Mêrdînê û lîseyê li Edeneyê xwend. Li Stenbolê zanîngeh xwend û gelek xwendevanên kurd nas kir. Apê Mûsa ji bo ku xortên kurd li dora xwe kom bike û him ji aliyê madî ve him ji aliyê manewî û siyasî ve xwedî li xwendevanên kurd derbikeve Wargeha Dîcle û Firatê vekir. Apê Mûsa bi Canîp Yildirim û Yusuf Ezîzoglu re li Amedê dest bi karên rojnamegeriyê kir û rojnameya "Îlerî Yurd"ê derxist. Ji ber helbesta xwe ya "Qimil" ku di rojnameyê de tê weşandin doz li Apê Mûsa hat vekirin û hat girtin. Di heman demê de 50 kesên ku piştgiriya Apê Mûsa kirine hemû jî tên girtin û darizandin.

Dîsa di sala 63'yan de bi navê 'Doza 23' tê li Stenbolê, nêzî salekê di zindanê de dimîne. Di sala 65'an de ji bo parlamenteriyê bi awayekî serbixwe tev li hilbijartinê dibe lê dewlet rêya wî digire û nahêle. Di sala 67'an de careke din salek ceza lê tê birîn û sirgunî Çanakeleyê dibe. Di sala 1971'ê de careke din tê girtin û piştî ji girtîgehê derdikeve, di 1976'an de vedigere gundê xwe Stîlîliyê û heta 1989'an li gund dijî.

Di sala 1959'an de ji ber doza 49'an careke din hat girtin û tev li 49 hevalên xwe 6 mehan di girtîgehê de ma. Apê Mûsa pirtûka "Birîna Reş" li zindanê nivîsî. Ferhenga kurdî-tirkî û tirkî- kurdî ya bi 6 hezar peyvan pêkhatî, amade kir.

Di sala 1989'an de careke din berê xwe dide bajarê Stenbolê û di gelek kovar û rojnameyan de nivîs û serpêhatiyên wî têne weşandin.

Apê Mûsa ku di gelek rojname û kovarên mîna Welat, Ulke, Ozgur Gundem û Ozgur Ulke de nivîsên wî têne weşandin, ji hêla xwendevanan ve bi balkêşî dihatin xwendin. Birîna Reş, Qimil, Ferhenga Kurdî, Vakaî Name, Firat Marmaraya Akar, Hatiralarim ango Bîranên Min û Çinara Min berhemên Apê Mûsa ne. Apê Mûsa di bîranên xwe de gotibû, "Ez şahidê zindî û sondxwarî yê tengasiyên Tirkiye yê 55 salan im, gelo ez tenê şahid im? Na. Ez her wiha mehkûm, bersûc û dozgerê Tirkiyeyê me."

### Pir qîmet dida mirovan

Bi minasebeta 29'emîn salvegera kuştina Apê Mûsa kurê wî Dîcle Anter ji rojnameya me re axivî. Anter têkildarî doza Apê Mûsa destnîşan kir ku di 24'ê mijdarê de doz dê li Enqereyê bê dîtin û piştî wê jî 9 meh dimîne ku 30 salê dozê tije dibe ku doz bikeve. Anter destnîşan kir ku avahiya dadê heye, lê edalet tune ye. Anter wiha got: "Min di sala 1959'an de bavê xwe li Harbiyeyê di hepsê de nas kir. Wê demê ji ber doza 49'an girtî bû. Em diçûn zindanê, me cilê wî jê re dibir, me hevdîtina wî dikir. Me name jê re dinivîsî, wêne jê re dişand. Wê demê di hepsê de ferhenga kurdî nivîsîbû, me jî ew nivîsên ji bo ferhengê di bin cilê xwe de derdixist derve. Bi vî awayî me ew ferheng derxist. Piştî bavê min ji hepsê derket. Di 63'yan de dîsa hat girtin. Di zindanên wekî Sultan Ahmet, Mamak, Nisêbîn, Hepsa Leşkerî ya Seyrantepe, Saray Kapi, Harbiyeyê de ma. Piştî salên 65'ê hêdî hêdî min fêm dikir bê mesele çi ye. Di 67'an de ji ber dozên xwe bavê min salekê ceza girt û sirgunî Çanakaleyê kirin. Di 71'ê de bavê min dîsa girtin. Piştî ku di 74'an de efû derket ji Stenbolê çû gund. Di sala 80'yî de Darbeya 12'ê Îlonê çêbû dîsa ew girtin. Dema ku bavê min şehîd xistin ez 42 salî bûm. Ez gelekî xemgîn bûm."

Anter têkildarî mirovheziya bavê xwe wiha got: "Bavê min gelekî qîmet dida mirovan. Ji me zêdetir qedr û qîmet dida mirovan. Kê bihata mala wî çi hebûya dida mêvanên xwe. Tu carî nedixwest însanekî biêşîne. Li ser rewşa civaka kurd pir xemgîn dibû. Ji heft salî heta heftê salî têkiliyeke wî ya baş bi mirovan re hebû. Ji bo me ne wekî bav, wekî heval bû."

Anter têkiliyên xwe û bavê xwe wiha vegot: "Min bi gogê dilîst. Ez jêhatî bûm. Min gol diavêt. Êdî navdar bûbûm. Rojekê bavê min hat. Ez û wî li Mêrdînê digeriyan. Zarokan bi erebî digotin, "Ebu-Dîcle Werek" yanî bavê Dîcle ye. Bavê min got, law ez hatime Mêrdînê min jiyana xwe ji bo vî gelî daye, ewqas ked didim, lê lawê min çûye du gol avêtiye bi golên wî min nas dikin. Lê kêfa wî jî dihat."

### 30 sal in doz didome

Anter qala doz û darizandina bavê xwe jî kir û wiha berdewam kir: "Di 24'ê mijdarê de doz dê li Enqereyê bê dîtin. Piştî wê jî 9 meh dimîne ku 30 salê dozê tije dibe ku doz bikeve. Em li ser vê dixebitin. Parlamentera HDP'ê Fîlîz Kerestecîoglu pêşnûmepirsek da meclise. Li aliyê din jî tişt diyar e û li holê ye. Yên ku şahidî kirine her tişt gotin. Ji bo min gotina herî balkêş gotina Mehmet Eymur e ku dibêje 'Ez xebatkarê îstixbaratê me. Ez nikarim hin tiştan bibêjim lê belê hert tişt li cem MÎT û Fermandariya Giştî heye'. Heke heyet li gorî agahiyên wan biryarê bide her tişt zelal e. Lê tiştekî wiha nakin. Mesela ev çend sal in em dixwazin Abdulkadîr Aygan guhdar bikin bi SEGBÎS'ê ku şahidê bûyerê ye lê nakin. Heta niha îfadeya wî negirtine. Gotinên Sedat Peker jî balkêş in ku dibêje ez tuxlayekî bikişînim dê ew dîwar hilweşe. Dêmekî ew dîwar bi xwîna ewqas mirovên hatine qetilkirin hatiye çêkirin."

### Edalet tune ye

Anter helwesta darazê rexne kir û wiha axivî: "Cînayeteke wisa nabe ku ber bi demboriyê bikeve. Lê hiqûq tune ye. Edalet tune ye. Saray heye lê edalet tune ye. Ewqas saray çêkirine lê tê de edalet tune ye. Heke ev doza Mûsa Anter çareser bibe dê ji bo Tirkiyeyê bibe gaveke mezin, aliyê hiqûqî de. Lê em dîsa jî dest ji doza xwe bernadin, em ê dozê bibin DMME'yê. Em li ber xwe didin. Lê ew li ber xwe nakevin."

### Çapemenî jiyan e

Anter herî dawî li ser rewşa çapemeniyê jî axivî û wiha bi dawî kir: "Ji salên 80'yî û vir ve, bi taybetî jî piştî têkoşîna çekdarî ya 84'an di çapmenenî, çand û hunerê de pêşketin çêbû. Bi taybetî ew xebatên ku bi Apê Mûsa û hevalên wî ve dest pê kirin di çapemenî û rojnamegeriya kurdî de jî xwe naskirinek çêbû. Berê dewletê dikaribû ser gelek tiştan bigire, lê niha ji ber ku ewqas teknolojî pêş ketiye nikarin veşêrin. Niha di çapemeniyê de ew ruh heye. Ji ber vê yekê dewlet nikare bi ser bikeve. Ji ber wê aciz dibin. Em dibêjin 'Berxwedan Jiyan e'. Ez jî dibêjim çapemenî jiyan e."





Xweşkanî

Felemez Ulug

## Artêşa leşkerê xwe dikuje

Artêşa tirk ji 23'ê Nîsanê û vir ve li Herêmê Parastinê yên Medyayê bi alîkariya hevkarên xwe ve dest bi tevgereke berfireh ya dagirkeriyê kiriye. Têkildarî şer û pevçûnên li vê herêma ku bi her awayî hatiye dorpêçkirin jî navenda ragihandin û çapemeniyê ya HPG'ê li gor derfetên xwe yên heyî rojane agahiyan bi raya giştî re parve dike. Li gor van agahî û dîmenên ku tên parvekirin diyar dibe ku dewleta tirk vî şerî wek şerê man û nemanê dibîne. Bi hemû hêza xwe êrîş dike û hewil dide derb li şervanên azadiyê bixe. Gerîlayên Kurdistanê jî bi taktîk û hişmendiya gerîlayên serdemê li dijî van êrîşên topyekun berxwedaneke bêhempa raber dikin. Ev berxwedan ji qehremaniyên gelek mezin re jî şahidiyê dike.

Ji salên 80'yî û vir ve dewleta tirk bi têgeha ku wê tevgera azadiya Kurdistanê têk bibe an jî darbe lê bide li nav sînorê başûrê Kurdistanê êrîşên qirkirinê pêk tîne. Ji wê demê heya niha artêşa tirk li dijî gerîla negihîşt armanca xwe. Artêşa ku li dijî gerîla nikare pêş ve biçe û serkeftinê bi dest bixe li herêmê ji xwe re hevalbend çêkirin. Hevkariya PDK'ê ya bi dewleta tirk re encama vê hewildanê ye.

Bêguman dewleta tirk çawa ku li başûrê Kurdistanê ji xwe re hevkar dîtin li bakurê Kurdistanê jî kesên xwefiroş li dora vê armanca xwe ya kirêt kom kirin. Pergala cerdevaniyê mînaka vê ya herî berbiçav e. Bi desthilatariya AKP'ê ve di vê pergalê de jî hin guhertin hatên çêkirin. Di çarçoveya şerê li dijî kurdan de artêşa tirk di sazîbûn û rêxistinbûyîna xwe de hin guhertinên bingehîn çêkirin. Ji ber ku em Kurd li ser van mijaran zêde hûr nabin guhertinên ku tên çêkirin jî bi xwe re bandorek çawa çêdikin, em naşopînin, an jî nizanin.

Yek ji van guhertinên ku desthilatdariya AKP'ê di nava artêşe de pêş xist jî projeya leşkerê bipeyman bû. Di vê projeyê de armanc ew bû ku di şerê li dijî kurd de artêşeke hîn bihêztir û profesyonel bê sazkirin. Ji ber ku li Tirkiyeyê, li gorî nifusa heyî rêjeya bêkaran pir zêde ye û gelek ciwan nikarin kar bi dest bixin, ev proje jî wek kar hat pênasekirin.

Bêguman di vê mijarê de rola medyaya hawiz pir zêde ye. Ger em bi bîr bixin, di serdema ev proje hat nîqaş kirin û heya ku ket meriyetê de, di hemû televîzyonên li ser qaşo "qehrementiyên leşkerên tirk" de rêzefîlmên sosret hatin çêkirin. Bi van fîlman bi taybet xwestin berê ciwanan bidin vê projeyê. Wek me got ji ber bêkarî û rewşa xerab ya aboriyê gelek ciwanan berê xwe ji neçarî dan vê projeya şerê qirêj.

Li Tirkiyeyê gelek ciwanên zanîngeh qedandine û xwedî pîşeyên cuda ne ji ber nebûna kar û rewşa xirab ya aboriyê di nav qirîzeke civakî û psîkolojîk de ne. Desthilatdariya AKP ji bo berê van ciwanan bide vê projeyê gelek hewl da. Di encamê de bi pêşxistina nijadperestiyê û propagandaya leşkertiyê ve gelek ciwan tev li vê projeyê kirin.

Ev leşkerên di nav artêşa tirk de wek çawîşê pispor tên pênasekirin li bakurê Kurdistanê hemû qirêjiyê dikin. Ji dijî gelê Kurd ji bo xwe her tiştî rewa dibînin. Kuştin, talan, tecawiz û hwd. di gelek bûyeran de tiliya van leşkerên bipeyman heye.

Ji ber van kiryarên qirêj artêşa tirk têkildarî van kesan agahiyan jî qet parve nake. Ev kesên ku di çarçoveya vê projeyê de tên wezîfedarkirin li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê di nav emelên xirab de ne. Di şerê li dijî Kurd de kesên ku tên kuştin jî li gor peymana ku bi wan re hatiye kirin di ragihandina xwe de qet behsa wan nakin. Ji ber ku ew jî baş dizanin ku ger kuştina van kesan bê rojevê dê pirsa 'çi karê wan li wir hebû' bê kirin. Lewma ji Libyayê bigire heya Sûriyeyê, ji Iraqê bigire heya Azerbaycanê ev leşkerên ji eslên xwe dûrhatine xistin tên wezîfedarkirin.

Artêşa tirk di şerê li dijî gerîlayan de jî hêviya xwe bi vê artêşa qirêj girê daye. Ji bo ji şerê li herêma Avaşîn, Zap û Metînayê diqewime ev artêşa kontra encam bigire, NATO jî heya dawî piştgiriya xwe jê re raber dike. Li cihê ku ev artêş bin dikeve, têk diçe jî her bêdeng dimînin. Miriyê ku çêdibin jî ji nedîtinê ve tên.

Di hefteya borî de li herêma Zapê bûyereke bi vî rengî qewimî. Leşkerên ku dewleta tirk hemû hêviya xwe bi wan girê daye, li dijî gerîla têk çûn. Leşkerên ku nikarîbûn li ber êrîşên gerîlayan li ber xwe bidin xwestin teslîm bibin. Artêşa tirk a ku dît leşkerên wê teslîm dibin, bi xwe leşkerên xwe kuşt. Li welatekî demokratîk û hiqûqî de ev bûyer dibe sedem ku hemû rêvebiriya welat ji wezîfeyê bê girtin. Lê dema mijar Tirkiye be û şer jî li dijî kurdan be hemû rê û rêbaz, di nav de kuştina leşkerên xwe jî rewa ye.

Têkildarî bûyera qewimiye Navenda Ragihandinê û Çapemeniyê ya HPG'ê di 15'ê Îlonê de bi daxuyaniyekê ev agahî dabû:

"10'ê Îlonê li qada Şamkê ya Zapê leşkerekî artêşa Tirk xwest teslîmî gerîla bibe. Leşkerên Tirk ji bo ev leşker teslîm nebe wî gulebaran kir û kuşt."

Piştî vê agahiyê ANF'ê dîmenê nasname, kelûpelên leşkerî û alavên şexsî yên vî leşkerê ku ji aliyê artêşa tirk ve hatiye gulebarankirin parve kir.

Hat eşkerekirin ku navê leşkerê hatiye kuştin Sezaî Gungor e û ji navçeya Wanê ya Payîzavayê ye. Têkildarî kuştina Sezaî Gungor heta niha ji dewleta tirk û rayedarên wê tu daxuyanî nehatiye dayîn. Dîsa çapemeniya şerê taybet a tirk jî di vî warî de hê jî bêdeng e.

Wek di vê bûyerê de jî tê dîtin ku dewleta tirk bi her rêbazî li dijî kurda di nav şer de ye. Ji bo vî şerê xwe yê qirêj jî gelek Kurdan jî wek hevalbend ji bo xwe bi kar tîne. Cihê ku karê wê bi wan xelas dibe jî bi vê awayî wan ji holê radike.

# Reng û rûyê wê diguherînin

Navenda Nûçeyan

**Efrîn bi xweza, dîrok, civak û rêveberiya xwe wekî bihuştê aram bû. Bi dagirkirina Tirkiyeyê re cihên dîrokî hatin talankirin, komên çeteyan hatin bi cihkirin û ew aramî ji holê hat rakirin**

Piştî di adara 2018'an de Efrîn hat dagirkirin, heta niha gelek binpêkirin û sûcên mirovahiyê û şer li dijî gelê Efrînê pêk hatin. Ji bo xelkê Efrînê mecbûrî koçberiyê bikin bi gelek awayan mafên mirovan têne binpêkirin. Ji bo guhertina demografîk pêk bînin gelek mafên mirovan binpê dikin. Dewlet û siyaseta Tirkiyeyê sê sal û nîv in li ser vê yekê dixebitin. Yek ji dosyayên hêzên îslamîst û cîhadîst ên girêdayî Tirkiyeyê girtin û revandin e. Ji roja Efrîn dagir kirine heta niha revandina mirovan didome.

Têkildarî rewşa Efrînê ya 3 sal û nîvên dawî Rojnameger û çalakvanê xelkê Efrînê Muhamed Bilo agahiyên rewşa dawî bi me re parve kirin. Bilo anî ziman di sê sal û nîvên dawî de nêzî 10 hezar welatiyên kurd tûşî revandin û girtinê bûne û wiha got: "Di meha tebaxê de 5 heb jin bi giştî 134 welatiyên kurd hatine revandin. Kal, pîr û ciwan jî hene. Di hefteya yekemîn a îlonê de 3 jê jin bi giştî 16 kes hatin girtin."

**30 komên çekdar li Efrînê hene**

Bilo da zanîn ku kesên têne girtin û revandin ji ber kurd in têne revandin û wiha axivî: "Ew bi sedemên rakirina çekan, tevlêbûna hêzên YPG'ê û têkiliya bi Rêveberiya Xweser re mirovan digirin. Ji bo wan di aliyê aborî de bêzar bikin û koçber bikin fîdye ji wan distînin. Hin çavkanî qala hezar-hezar û sed kesên girtî dikin. Rayedarên Tirkiyeyê heta niha destûr nedane ku parazvanên mafên mirovan ên serbixwe derbasî zindanan bibin. Li Efrînê û derdora Firatê jî gelek zindan hene. Zindana herî tê zanîn Zîndana Raa ye. Zindana Raa li herêma Babê ye. Piraniya girtiyên kurd dişînin vê zindanê. Yek ji zindana navendî ya li Efrînê Zindana Maratê ye. Ji xeynî hêzên Tirkiyeyê nêzî 30 komên çekdar li Efrînê hikûm dikin."

**Dixwazin Efrînê bikin dojeh**

Bilo bal kişand ser ewlehiya şêniyên Efrînê û wiha berdewam kir: "Di nava Artêşa Niştimanî ya Sûriyeyê (ANS) de nêzî 30-31 komên çekdar hene. Tirkiyeyê çend gund dane wan. Li gorî mezinbûna komên çekdar 5-6 gund dane koman. Komên çekdar li wir xelkê digirin, dikujin, dest datînin ser mal û milkên wan. Li herêma Efrînê hukmê daristanan li wir tê meşandin. Serokên komên çekdar li wir li gorî dilê xwe biryaran didin. Kes nikare hesab jê bipirse û wî darizîne. Tirkiyeyê desthilatdara mutlaq a bêserûber xistiye destê van komên çekdar. Ji bo Efrînê ji gelê Efrînê re bikin dojeh her tiştî dikin."

Bilo li ser erdnîgariya Efrînê jî rawestiya û wiha lê zêde kir: "Nêzî 4 sed gundên wê hene. Nêzî 3 hezar kîlometre çargoşe fireh e. Ji sedî 97 xelkê wê kurd bûn. Hinek eşîrên ereban hebûn. Ew jî di salên 1960'î de hikûmeta Sûriyeyê anîn li Efrînê bi cih kirin. Beriya ku Efrîn bê dagirkirin nêzî 350 hezar kurd lê hebûn. Bi hezaran jî xelkên ereb hebûn. Piştî şerê 2018'an nêzî 200 hezar însan hatin koçkirin. Niha nêzî 100-125 hezar însanên ku piraniya wan kal û pîr in mane. Hejmara keç û xortan di nava wan de pir kêm in. Piştî koçkirinê, li gel îtîfaqên Astana ya Rûsya û Sûriyeyê guhertina deveran çêkirin. Gundiyên li herêma Şam, Hemas û Idlibê anîn li Efrînê bi cih kirin. Xelkê Efrînê ji Efrînê koçber kirin. Malbatên li Efrînê bi cih bûne, malbatên çekdar ên îslamîst in. Nêzî 400 hezar kes ji derve anîn li malên kurdan (efrîniyan) bi cih kirin."

**Li Efrînê gundên nû ava dikin**

Bilo li ser guhertina demografiyê jî rawestiya û wiha pê de çû: "3-4 meh in planeke nû dane destpêkirin. Gundên nû li Efrînê ava dikin. Ji bo xelkên ereb û turkmenan gundên nû ava dikin. Li ser axa êzdiyan li tenişta gundê Bafrûnê gundekî nû ava kirine. Gundek jî nêzî gundê Xanta yê navçeya Şêrava ava kirine. 2 gundên din li ser Çiyayê Qaziklî ava kirine. Gundê din li nêzî gundê Şadêrê yê navçeya Cindirêsê ava kirine. Li navçeya Şiyê jî bingeha 3 gundan danîne. Tirkiye dixwaze rûyê demografiya Efrînê bê guhertin. Gundên têne avakirin, fînansa xwe ji komeleyên girêdayî dewletên Qatar û yên ereb digirin. Tirkiye û oposîzyona Sûriyeyê, îtîlafa Sûriyeyê hewl dan pereyan ji hin dewletên ewropayê bînin. Lê ev pêk nehat. Niha dest avêtine komeleyên xêrxwaziyê yên girêdayî rêxistina navdewletî ya Îxwanê Muslimîn (Birayên Muslimîn). Bi taybetî alîkariyê ji komeleyên li Qatar, Kuwêt û Îsraîlê digirin."

**Çand û dîrokê wêran dikin û didizin**

Muhamed Bilo bal kişand ser talankirina warên dîrokî jî û wiha pê de çû: "Her komeke çekdar dest danîne ser çend gundan. Mal û milkên efrîniyên koçber bûne bi temamî desteser kirine. Bacê li ser xelkê ferz dikin. Hem malên wan desteser kirine û hem bacê li wan ferz dikin. Efrîn di aliyê şûnwarên dîrokî de herêmeke pir dewlemend e. Ji roja dagirkeriyê heta niha, tîmên taybet ên Tirkiyeyê bi alavên taybet, şaristaniyên ji hezaran salan mane, dikolin û berhemên dîrokî didizin. Li gorî rêxistina li ser meseleyên şûnwaran lêkolîn dike, heta niha 71 cîgehên dîrokî hatine kolandin. Gelek girên şûnwarî ne. Bi dozer û kepçeyan giran dikolin û xera dikin. 3 cihên herî navdar ê di lîsteya UNESCOyê de hatine tomarkirin hene. Cîgeha Girê Endarê ye. Şêrek li ser e. Ev şêrê ku ji Şaristaniya Mîtaniyan maye hatiye dizîn. Dîsa cîgeha din ê Nebîhorî ye. Ew jî bi şanoya xwe ya dîrokî ku ji Romayan mabû tê nasin. Jê re dibêjin Bajarê Qurş yan jî Sîrûs. Xelkê herêmê jê re dibêjin Nebîgorî. Tev bi kepçe û dozeran kolandine û berhemên li vir derketine tev dizîne."

Bilo helwesta hikûmeta Sûriyeyê jî rexne kir û wiha bi lêv kir: "Heta niha li ser diziya van şûnwaran tu rapor amade nekirine û tu daxuyanî nedane. Hikûmeta Sûriyeyê li dijî dagirkirina Efrînê tu gav neavêtiye. Rêxistinên kurdan tenê li ser asta ragihandinê dixebitin û wan belge dikin. Van belgeyan dişînin rêxistinên navdewletî."

**550 hezar darên zeytûnê birîn**

Bilo bal kişand ser darên zeytûnan û bereketa axa Efrînê û talankirina piştî dagirkirinê û ev agahî parve kir: "Cihekî herî zêde bi bereket e. Cihê herî bingehîn ê darên zeytûnan e. Berî Efrînê dagir bikin nêzî 18 milyon darên zeytûnê hebûn. Dahatûya gelê Efrînê li ser çandiniya zeytûnan bû. Dar û berên fêkiyan jî hene. Bi taybetî li navçeya Reco û Bilbilê rez pir in. Gelê Efrînê di aliyê pîşesaziyê de pir çalak e. Li wir fabrîqeyên çêkirina sabûnê û komirê hebûn. Nêzî 17 fabrîqeyên girêdayî çandiniyê hebûn. Tev hatin talankirin. Nêzî 550 hezar darên zeytûnê hatine birîn. Wan dikin êzing û difiroşin herêma Idlib, Ezaz û Tirkiyeyê. Daristanê dibirin û dişewitînin. Ji 30 hezar hektar daristanên xwezayî, 11 hezar hektar hatine tunekirin."

**Ziman bi tirkî û erebî ye**

Muhamed Bilo herî dawî li ser rêveberî û perwerdeya li dibistanan jî rawestiya û wiha got: "Piştî dagirkirinê Tirkiyeyê li Efrînê encumenên xwecihî çêkirin. 7 encumen in. Yek jê jî bajarê Efrînê û 6 jî ên navçeyên derdorê ne. Tu erka wan tune. Nikarin tu xizmetê bikin. Desthilatdariya herî mezin a çekdaran e. Ev encumen meseleya perwerdeyê jî bi rê ve dibin. Perwerdeya li aliyê Cindirêsê, Qirikxanê, Şerran û Efrînê di destê wan de ye. Materyalên di perwerdeyê de têne xwendin aydî oposîzyona Sûriyeyê ne. Bi erebî ne. Li bajarê kurdan zimanê kurdî ne fermî ye. Zimanê perwerdeyê kirine tirkî û erebî. Di Rêveberiya Xweser a Efrînê de zimanê perwerdeyê bi kurdî bû. Materyal bi kurdî bûn. Navê kolan, tax û qadan tev ewil bi kurdî û pişt re bi erebî dihat nivîsandin. Lê niha tenê bi zimanê erebî û tirkî ye. Zimanê kurdî li hin dibistanan hefteyê tenê 2 saetan tê dayîn. Li 6 navçeyên Efrînê zimanê kurdî tune ye. Tenê li bajarê Efrînê 16 dibistan hene. Ji van 16 dibistanan jê 4 dibistan kirine baragehên leşkerî. Komandoyên Tirkiyeyê di dibistana Feysa Qedûr de cih girtine. Di dibistana bazirganiyê de jî polîsên leşkerî cih girtine. Dîsa li dibistana Eshar Efrîn polîsên sivîl ango îstîxbarata Tirkiye cih girtiye."





# Krîza li Afganistanê û faktora penabertiyê



Kurdistan Lezgiyeva

*"Mafê parastinê yê her koma civakî pîroz e. Li hemberî her cure êrîşa li ser hebûna komekê û nirxên bi ser hebûna wê ve hebûna hêza parastinê, ji bilî mafekî dest jê nayê berdan, sedemeke hebûnê ye".*

*Abdulla Ocalan*

Rewşa Afganistan û herêmên cîran pir dînamîk e. Hejmareke girîng lîstikvanên hundur û derve pêşbîniya bûyerên dijwar dikin û xetereyên zêde yên pêvajoyên nekontrolkirî diafirînin. Di nav cîranên Afganistanê de, welatên Asyaya Navîn ji yên herî kêm stabîl in û ji şokên derveyî re di nav xetereyê de ne.

Asyaya Navîn herêmeke tevlihev e ku gelek deverên teqîner lê hene. Faktorên metirsiyê: Pirsgirêkên sînorî yên neçareserkirî yên di navbera Ozbekistan, Qirxizistan û Tacikistanê de, têkiliyên tevlihev en etnîkî, zêdebûnkêmbûna av û axê, diyardeyên ekstremîzma dînî, bazirganiya narkotîkê, tebeqekirina milkên girîng, qalîteya kêm a karûbarên civakî.

Di van 2 salên çûyî de, rewş ji ber bandora neyînî ya pandemiya Covît-19'an aloz bûye - girtina sînoran li koçbûna ber bi Rûsyayê xistiye û di heman demê de rêwîtiya îslamîstên radîkal li Rojhilata Navîn dijwar kiriye.

Bûyerên ewlekariyê yên herî balkêş li herêmê şerê navxweyî yê salên 1990'î li Tacikistanê, pevçûnên navetnîkî li Qirxizistan û Qazaxistanê û her wiha pevçûnên sînorî yên vê dawiyê di navbera Qirgizistan û Tacikistanê de li Geliyê Ferganayê pêk tê. Di heman demê de çalakiyên protestoyî yên dijî Çînê yên li Qazaxistan û Qirzizistanê jî balkêş in.

Yek ji encamên herî berbiçav ên krîza li Afganistanê herikîna hemwelatiyên afgan e ku dixwazin ji welêt derkevin. Çend sed kesî berê xwe dane Qirxizistanê, di nav wan de xwendekarên ku li gorî bernameyên Dewletên Yekbûyî di saziyên perwerdehiyê de xwendine jî hene. Belavkirin û bicihkirina mirovan ji hêla Wezareta Derveyî ve tê birêvebirin.

Varyanteke din jî ev e ku mirovên koçkirî bi kar bînin da ku agahdariya li ser axa mayîna xwe berhev bikin. Ji bo afganiyên ku wekî agahdarvan tevdigerin re ev ê ne zehmet be. Tenê 3-5 sal in mirov li bendê ne ku pêwendiyan bi cihekî nû yê rûniştinê re ava bikin. Piştgiriya darayî dikare armancê hêsan bike. Pêla penaberan dikare bibe sedema encamên cuda. Berî her tiştî, ev ê bi hêjmara pêlên koçberiyê ve girêdayî be.

Li welatên herêmê, di serî de Qazaxistan û Qirxizistan, dibe ku komek zêde ya mirovên dilsoz ên Dewletên Yekbûyî yên ku ji dil ji Talîbanê nefret dikin (rêxistin li Rûsyayê qedexe ye) xuya bike. Afganî dikarin wekî amûrekê ji bo çareserkirina pirsgirêkên DY'yê li herêmê werin bikaranîn. Wekî din, komên xwendekar, çalakvan û parêzvanên xwedî tecrube dikarin beşdarî berhevkirina agahdariya veşartî bibin. Siyasetmedarên herêmî, karbidest û kesayetên giştî dê bi xwe têkiliyê daynin, nemaze ger hin afganî wekî belavkarên bexşan tevbigerin. Her wiha ger hejmara penaberan ji çend hezaran derbas bibe, dê encamên li vê herêmê zêdetir bibin.

Zêdetirî 3 mîlyon tacîkên etnîkî li Afganistanê dijîn (daneyên rastîn nayê zanîn, hêjmara dawî ya nifûsê zêdetirî 40 sal berê hate kirin), her wiha ji bo turkmen, ozbek, qirxizan jî wisa ye. Veguhastina hejmareke girîng a tacîk an ozbekan li welatên Asyaya Navîn dibe ku bibe sedema guhastina pêkhateya etnîkî ya welatan û hem jî çêkirina hêlînên zêde yên tengezariyê. Di rewşa herî xirab de ev dikare bibe sedema pevçûnên di navbera etnîkî de, dijwarbûna pevçûnên li ser sînor û ji nû ve dabeşkirina waran bi bandora komên sûcdar.

Ez ê varyanta ne mumkun jî destnîşan bikim -penaber dikarin hemwelatiya welatên Asyaya Navîn bistînin û wekî hemwelatiyên bêkêmasî digel hemû pirsgirêkên ku ji bo Federasyona Rûsyayê derdikevin biçin Rûsyayê.

Dewletên Yekbûyî û hevalbendên wê dest bi kampanyaya "Rûsya û Çîn di serketina Talîbanê de sûcdar in" kir. Armanca vê kampanyayê di serî de penaberên ji Afganistanê ne û pêdivî ye ku ji wan re "bi rengekî rast vebêjin" kî ji êşên wan sûcdar e. Ji ber ku yên dikin û yên ku qaşo şermezar dikin jî ji yek malê ne.

Dixwazim dîsa nivîsa xwe bi gotinên Rêberê Gelê Kurd birêz Abdullah Ocalan bi dawî bikim:

*"Dema ku desthilatdarî bi tevahî civakê dixin, ev nayê wê maneyê ku gelekî bi hêz bûye. Di heman demê de tê wê maneyê ku gelekî neçar e, belengaz e, di pêvajoya jihevdeketinê de nêzî qonaxa dawî û leza dawî bûye. Jixwe diyardeya desthilatdariyê wexta bi modernîteya kapîtalîst tê avakirin nexweşiyek e û mirov dikare wê wisa bihesibîne ku gihiştiye asta rizînê. Bêhn pê ketiye, genî bûye. Bi gotina Bakunîn desthilatdarî ewçend riziyaye ku mirovê herî biexlaq û saxlem xwe pê bike dê nexweş bikeve".*

# Mannheîm û boçûnek li ser îdeolojiyê

Ezîz Nê'metî

Mannheîm bi lêkolînekê li dor mercên berbiçav, behsa civaknasiya zanyariya xwe dike. Ji bo wî tenê cîhana berbiçav an cîhana konkiret cîhana rastî ye û tenê cîhana han hêjayî lêkolîn û nirxandinê ye. Ew dibawere rastiya berbiçav e ku zanyarî û nasyariya rasterast û nerasterast diafirîne. Loma erka serekî ya civaknasan 'ravekirina peywendiyên nava nasîn û hebûnê' ye.

**1**

Têrma 'îdeolojî' li gorî civaknasiya zanyariya Mannheîm xwedî roleke bingehîn û kartêker e û pêwîst e di destpêka vê behsê de were danasîn. Ev peyv di şiroveya xwe de wekî têgeheke takewateyî nehatiye bikaranîn.

**2**

Mannheîm dibêje ku li gorî wî têgeha îdeolojiyê du wateyên ciyawaz dide ber xwe: Yek; wateya hûrik a ideolojiyê, dudu; wateya girik a îdeolojiyê.

Bi baweriya wî wateya hûrik girêdayî bi rewşekê ye ku di wê de, koma serdest a civakê, ewqasî di parastina rewşa jiyan û civakê de xwedî berjewendî ye ku êdî pirsgirêk û kêşeyên heyî seh nake; bawermendên berjewendîxwaz ewqasî bi hêz in ku dibine eger da kom bi şêwazekî nehişyarane 'helûmercên rastiyên civakê him ji xwe re him jî ji kesên xeyrî xwe re ji tiştê heyî cihê bixuyînin û bidin selimandin'.

Mannheîm dibawere ku herçend îro roj ew têgeha îdeolojiyê, di 'teoriya ideolojî'yê de tê bikaranîn lê hemîşe ne bi heman rengî bûye. Ew piştî ezmûn û lêkolînên dîrokî yên têgeha îdeolojiyê digihe wê akamê ku têgeha îdeolojiya hûrik ji rewşa di navbera dereweke sade û çewtiyekê ku akama têgeha dezgehekî çelexwar û şaşfam de ye. Ango têgeha hûrik a îdeolojiyê amaje bi rewşekê dike ku di wê de em wisa difikirin ku bîrûbawerî û karûkiryarên dijî me gumanbar in û em wan wekî çelexwariyeke bi enqest û mebestdar a dûr ji rastiyê dibînin.

**3**

Ev çelexwariyên han 'cûreyên ciyawaz bigire, ji dereweke agahdarane ta çelexwariyên nivhişyarane û nexwestî di xwe de dihewînin'. Di têgeha girik a ideolojiyê de nêrînên giştî yên komeke taybet ku li ser biryarên yeko yeko yên komê bandordar e ji nû ve tên avakirin. Li vir Mannheim amaje bi îdeolojiya serdem an komeke dîrokî-civakiya taybet, ango çîn û taximeke destnîşankirî dike ku li ser esasê xwesiyet û pêkhateya hizira serdemê çêdibe.

Mannheîm nîşan dide ku çawa wateya îdeolojiya hûrik a di demên borî de ber bi wateya îdeolojiya girik a serdema nû ve tê guhertin.

Ew dibêje, "Îro roja bedel meyla xuyandina vê rastiyê ye ku dijmin duçarî xerifîn û fetilîna ruhî û ezmûnî bûye, kom bêtir hez dike binyatê giştî yê agahdarî û hizira dijmin bi rêyeke giştalî bide analîzkirin".

**4**

Li gorî Mannheîm, têgeha girik a îdeolojiyê du astan di xwe de dihewîne; yek têgeha girik a taybet û ya din têgeha girik a giştî. Têgeha girik a taybet wê deme wate digire ku takekes rewşa taybetiya xwe naxîne bin pirsiyarê û wê weke ferzîneyeke tew û xweser dihesibîne, di halekî de ku bîr û baweriyên aliyê li hemberî xwe tenê weke tiştên girêdayî bi rewşa civakî ya wî raçav dike. Di vê binyatê de nerînên kesê li hember(dijber) di gelemperîtiya wê de tê nirxandin. Berevajî, têgeha girika giştî girêdayî bi wê rewşê ye ku di wê de takekesê lêkoler 'ne tenê bîr û baweriyên kesê li hember, belkî hemû nêrîn û heta nêrînên xwe jî dide ber analîzkirina îdeolojiyekî'.

Bingeha vê helwestê, ev bawerî ye ku komek dikare xapînkar be lê esasê vê fehma xapînok, ne meyla xapînkariyê ye belkî ew encama rewşa civakî ya wan e ku wan ber bi fehma hanê han dide.

**5**

Mannheîm tekez dike ku tenê bi rêya vê formûlbendiya giştî li ser têgeha îdeolojiya girik e ku teoriya îdeolojiyê tê nava civaknasiya zanyarî. Loma civaknasiya zanyarî çi qasî ku li çawaniya peywendiyên nava îdeolojiya komekê û helwestên ramyarî yên wê komê bigere, bi têoriya ideolojîk re xwedî rayeke hevpar e.

Ji aliyê din ve ta ku civaknasiya zanyarî berevajî têgeha hûrik a îdeolojiyê ku li gorî wê, helwestên dijberan weke derew û vir û hîle û di akam de şaş tên destnîşankirin û van helwestan weke pêwîst çewt û şaş nehesibîne, ji teoriya îdeolojiyê cihê dibe.

**6**

Ew tiştê ku ji civaknasiya zanyarî re girîng e eşkerekirina van peywendiyan û xuyandina vê çendê ye ku "binyatên hizirî" yan cûreyên zanînê li ser esasê mercên dîrokî, civakî yên cûr bi cûr bi şêwazên awarte hatine çêkirin; bêyî yek ji wan cîhanbîniyan çewt werin hesibandin. Mannheîm ji bo ku xwe ji tevliheviya du têgehên girik û hûrikên îdeolojiyê di behsa civaknasiya zanyarî de biparêze, berdêla têgeha girika ideolojiyê peyva "wîzyon" bi kar tîne. Mebesta wî ji peyva wîzyon "rewşa civakî û dîrokî ya takekesekî/ê ye ku çawaniya famkirina tiştan li gorî wî/ê destnîşan dike". Li gor raya Mannheîm famkirina bawerbar a van rewşên dîrokî û civakî rasterast girêdayî bi famkirina sîstemên hizirî yên hevçerx in.

Loma em nikarin bibêjin ku mirov ji hev cihê difikirin belkî "mirovên endamên komên taybet in ku şêwazê xasm ê hizirînê berfireh dikin".

Bi baweriya Mannheîm, her kes bi egera jidayîkbûn û mezinbûnê di civakê de bi du cûreyan tên pênasekirin;

• Ji aliyekî ve, ev kes tê nava rewşeke amade û




• Ji aliyê din ve, ev kes rastî modelên ji ber avabûnên hizir û kar û reftarî tê.

Mannheîm li ser vê baweriyê ye ku mirov dikare van nerînan tenê bi awayekî ezmûnî û pratîk bide ber nirxandin û hilsengandinê; bêyî ku mirov neçar be wan bi teoriyeke xas ve bi belge bike.

**Ev nivîs ji gotara farsî ya bi navê "Rexneyek Li Ser Civaknasî ya Zanyariya Karl* Mannheîm, *nîvîsîna E'zem Ravdirad" hatiye wergirtin û kurtkirin.*

# Pîvana psîkolojîk a xiyaneta PDK'ê li Başûr



Dr. Abdullilah Polat


Travmaya xiyanetê, bi têgînî ji hêla Jennifer Freyd ve yekem car hate destnîşankirin. Ew dikare wekî destdirêjiya mirovan ji hêla mirov an rêxistinên ku ew pê bawer in ve derbibire. Freyd travmaya xiyanetê wekî travmaya psîkolojîk a ku dema mirov di têkiliyeke pêbawer a nêzîk a êrîşkar de ye destnîşan dike, lê di heman demê de gava ku mirov hewceyî têkiliya di navbera wan de be jî dinirxîne.

"Trauma" peyvek yewnanî ye ku tê wateya "birîn"ê. Her çend yewnaniyan ev term tenê ji bo birînên laşî bi kar anîn jî îro travma birînên hestyarî jî dihundirîne. Piştî başbûna birîna laşî ya ji ber travmayê, nîşanên psîkolojîk jî dikarin derkevin. Reaksiyonên psîkolojîk ên li ser travmaya hestyarî; jê re "nexweşiya stresê ya piştî trawmatîkê" (PTSD) tê gotin. Nexweşiya stresê ya piştî trawmayê bi gelemperî piştî bûyereke zehf zexm; mîna şer, karesata xwezayî yan destdirêjiya cinsî yan laşî pêk tê.

Ew cîhana(der) ku mirov xwe lê bihêz dibîne, difikire ku dê tiştek bi min neyê, xwe bextewar û aram dibîne serûbinî hev dike û wî bi rastiya ku ew miriyek e, cîhan cihekî pir xeternak e û mirovên din xirab in re rû bi rû dihêle. Bi bandora travmayê re, mekanîzmayên tevlihev di mêjî de dixebitin û ev rewş ji tiştê ku mêjî dikare bipejirîne pir dûr dimîne; dibe sedema ku nîşanên ku mirovan bi domdarî aciz dike. Li şûna ku ew çareseriyan bibîne û pirsgirêkan bi xwe çareser bike, ew bi yên din ve girêdayî dibe (hêzek ji xwe mezintir). Ev tê wê wateyê ku ew mekanîzmayên xwe yên navxweyî dide îflaskirin. Plana ku PDK niha dixwaze li Başûr pêk bîne tenê bi vê yekê dikare were vegotin.

Ji ber ku travma tenê dibe sedema tirs û xofê naêşe. Belkî jî ya herî dijwar ku mirov pê mijûl bibe, travmayên ku herî dirêjtir dimînin ew travma ne ku ji xiyanetan, xiyanetên berbiçav peyda dibin. Di rewşa PDK'ê de, ji bo ku feraseta zêdebûna şîdeta li dijî têkoşîna azadiya kurd a ji bo berjewendiya Tirkiyeyê û travmayên ku ji ber wan çêbûne were fêhmkirin û bandorên van bên lêkolînkirin. Derdikeve holê ku têgihîştina travmaya xiyanetê bi awayekî têgihîştî û dîmensiyonel di girtina gavên pêşîlêgirtinê de gaveke navîn a girîng e. Travmaya xiyanetê ne tenê dibe sedema bêhêvîtî û tirsê, di heman demê de zirarê dide baweriya cîhanê û mirovên din. Di hêla sosyolojîk û dîmenî de jî girîng e. Ev xiyaneta PDK'ê wateyekê li ser wê yekê zêde dike; dibe ku travmayeke civakî kûrtir bibe û para wê jî di zirara yekîtiya kurdan de heye.

Ger travmayek bê fêmkirin, dikare bê dermankirin jî. Lê mixabin, dijwar e ku meriv li ser vê yekê biaxive. Ji ber ku ya li başurê Kurdistanê diqewime tevlihev bûye, lê divê mirov wê paşguh neke. Tecrûbeya trawmatîk a ku nayê asîmîlekirin wekî kabûs, paşverûtî, jinûveçalakkirinên behreyê, nîşanên somatîk, panîk û hêrs tên mecbûrkirin û dubarekirin. Tecrûbeya trawmatîk cihê kesê/a li cîhanê û nirxên wî/ê ên der barê xwe de tehdît dike. Di vê çarçoveyê de, hest û ramanên binirx û ewlehiyê, dîtina cîhanê watedar û meqbûl, têgihîştina mirovên din ên baş û alîkar, neşikestî û desteserkirî di bin xetereyê de ne. Ev bi siyaseta niha ya PDKê re hevseng e û bêhêvîtî serdest e. Divê bê zanîn ku ne mimkûn e mirov bi zihniyeta rêvebiriyê ya bi zordariyê tê rêvebirin û tehamulî heqareta hêzên din dike û hembêz dike, di axa xwe de bi cih dike, mirov xwe wekî berê bihesibîne.





Ne zêdegavî ye ku mirov bibêje dê di nexşeya tendirustiya giyanî ya mirovên Başûr de guhertineke mayînde çêbibe, nemaze dema ku em li şîdeta bûyerên li Başûr binêrin; komkujiyên wekî kuştinên kompleger û cinawir vê yekê diselmînin. Bandorên Şerê Viyetnamê li ser tevlêbûna PTSD di navnîşên tendirustiya giyanî de tên zanîn. Salên pêş me dê nîşan bide ku di şerê Başûr de bandoreke çawa li ser pirsgirêkên derûnî yên kurdan bike. Heya niha jî pêdivî ye mirov texmîn bike ku di van karesatan de wêneyên cihêreng hene, her ku diçe giliyên laşî zêde dibin.

Bandorên giyanî yên karesateke wisa mezin nayên tunekirin. Lê divê hewl bê dayîn ku ew kêm bibin. Ji ber ku zengilên felaketê li ber lêdanê ne. Pêwîst e bê zanîn: Pênaseya herî hêsan a karesatan çi ye? Dibe ku reaksiyoneke krîzê be. Ez gotarê bi gotinekê biqedînim: "Di jiyanê de hevsengiyek heye. Stresên rojane di balanseke diyarkirî de derdikevin holê. Hestên me di nav sînorekî de dilîzin. Her mirovek repertûarek heye ka mirov çawa bi stresa rojane re mijûl dibe. Felaket-travma hevsengiya mirov xira dike. " (Ciwan 1995)

# Raya Zera zaf derg a

Mehmet Guzel



Koyê Morî xeylê berz o… Gil de mij û duman qe kêmî nêbîyêne. Dem bi dem gilê koyî bîyênê paka labelê merdim heta şîyenê nêmeyê gilê koyî se nafa bîyêne gujaguja vayî. Va Koye Morî de qe nêbîyêne kêmî. Ko ge gane kewtêne bi hêrs, to dî fişeno û kufeno…kemeran û kuçan vaydano…aqilê merdimî nêresayêne nê halê Koyê Morîyî.

Koyê Gurlî ke verba Koyê Morîya yo..tirê terîşa Koyê Girlawokî ra xezalî kewenê tê dima jubîn ra enê cêr. Uca ra tadînê rîyê xo çarnenê verê Koyê Morîyî ra. Binê Koyê Morîyî de ju awe vejîna, awe awêka bimbarek a. Na awe ra vanê Awa Xizirî. Zelal a, zîyar a. Merdim qayte na awe bî se tede xo vîneno. Xezalî heta verê Koyê Morîyî ameyî verê çemî de vindertî. Tay xezalî çêmî ra dûr vindertî. Hay ke dûr vindertê ê xezalî nêrî bîy, haydarê yo zî benê.

Xezalan weşaweş awa xo şimite. Nê alemî de kamcîn mahluqat beno wa bibo vêşanî rê damîş beno labelê têşanîye rê damîş nêbeno. Xezala eke şimitişê awe baş kerd pira pira vîrena boverê çemî. Xuşxuşa çemî ya. Awe serdin a. Awe zelal a, awe heme çî ya. Awe weşî ya, awe haştî ya… awe bereketa Xizirî ya.

Xezalî çemî ra vîyertî bover. Cêr ra axmeyê koyî bî. Ko cola xezalan o. Ko çeyeyê xezalan o. Ko heme çîyê xezalan o. Xezalî pira pira, nazlî nazlî, çimî ra bîy dûr, yeman de, peyê tumayî de bîyî vîndî.

Ju hewro sîya dewe ser de axme bi, dewe hema bîye ting û tarî. Usiv verê çêberê çeyê xo de ameyêne şîyêne, rîyê xo oncîna recefîyayêne, destê xo nê hetî ra ê hetî ra kerd herdîşa xo ya sipîye ra. Sereyê xo kî têde recefîyayêne û lerzayêne. Destê xo şana peyê qina xo dormeyê cunî ra tadîya oncîna ame verê çeyeyî dime ra çeberê çeyî bî ya, cinîya Usivî, Fatê zî vejîyaye teber, a zî zana ke oncîna halê Usivî de ju şeytanî esta. Hama serê Usivî de hereşan kerd, ey ra vat:

-Nero Usivo şeytan û şakil û kakaz, ti oncîna çi şeytanî fikirîyenî, no çi halê to yo?

Hama Usiv hêrsê Fatê ra tenê ame xo, oncîna dest eşt ra herdîşa xo, soye kerd, dime ra kakaz kakaz qeseya xo ard war:

- Fa Fa Fatêêê ti oncîna mi mi mi ra çi wazena, heeeq keeena mi ra dûrî şo. Nooo lacê Go Go Go Gozelî oncîna rehet nêêêvinnndeno. Eeeez oncîna ju beterî bîyara eey ser. Laaacê Gooo Gooozelî mi mi zaf qaaarneno... vat:

Usiv bi Fatê verê çeberî de xeylê çenge kerd. Badê Fatê oncîna hereşan kerd Usivî ser o, ey ra vat:

- Nero kakaz kakaz ti qe nêşermayenî. Par to oncîna na şeytanî kerd. Meçîtî ra pîrî ameyî ma rê cem girê dayî. Ma bi dewijan verê pîran de dare vindertîme. Ma îkrar da, ameyîme were, no oncîna çi hal o kakaz.

Sereyê Usivî dahîna zêde recefîya. Nêzana ke se bikero… Sereyê xo girewt da raye şi zime, birr de bî vîndî.

Birr uskutî yo, birr weş o. Boya vilikan û çîçegan, boyêda weşe yena firna merdimî. Merdim verba na boya weşe de beno serxoş. Dotê bînî ra vengê teyr û çuçukan zê armonî yeno, no veng ruhê merdimî keno rehet.

Wexto ke dûrî ra kuzayîşê luye ame, merdim zaneno ke luye janê zerrîye girewto…

O dem orteyê zimî ra ju awreş vejîya, tersan ra ti vanî qey cîger û pişkê co bîy lete.

Usiv xorîyê zimî de sîya ju dara mazêre de xeylê nîşt ro. Xo bi xo fikirîya, dem bi dem xo reyde da piro. Xo ard û berd, peynîye de qerar da. Lacê Gozelî gere keno.

Dewe de xeylê merdimî lacê Gozelî ra qarînê. Hendê merdimî lacê Gozelî ra çay qarînê? Çike lacê Gozelî zaf xo ver dano, hem kî zaf îtîqartin o. Ardimîya heme kesan keno. Ê ke feqirî vazdano karê înan. Ebe deynî genim, ardî û toraq dano dewijan labelê ê ke zaf feqîrî înan ra peyser çîyî nêgêno. Nê sebebî ra camêrdê dewe lacê Gozelî, Îsî ra zaf qarîyenê.

Şefaq eşt, tarîye herinda xo verda roştîye. Tîje hema rîyê xo nêmusna tabîatî. Lacê Gozelî, Îs (Îsmaîl) uşt ra, vejîya teber. Şî çirtane dest rîyê xo şutî. Peyser ame verê çeberê çeyê xo. Qaytê kutikan xo bî. Kutikî binê şeqanê Îsî ra kewenê ci vejênê. Lewanê xo lêsenê. Belîyo ke kutikî vêşan ê. Îs kewt zere vejîya. Kutikan rê ebe awa germe ju lap viraşt. Kutikan pîzeyê xo kerd mird.

Cinsê kutikan xeylê rind bî. Xo şanayêne vergan. Qirçilin û dêw rîyê kutikan şanaybi qerîye, hona leyîr bî, goşî înan kerdîbî cira.

Tîje darî we, lacê Gozelî, Îsî vera tîje destê xo kerd ya û vat: “Ya Xizir, ya Heq, ya şahê merdan Alî, ya Usenê Kerbelayî ti tengîye de, ti zorîye de birese feqîran. Derdan rê derman bibe. Rizqê heme teyr û tur û heywanan bide. Merdimatî rê raya zelal û raşt bimusne, hala hala eywallah” û dua û gulbangê xo qedêna.

Koyê Girlawokî hetê Zera der o. No ko ca be ca berzîya xo ferq kena. Virarde û çaqilin o. Verva hetê Zera bi Qanqalî jubînî ra birneno. Yenîme hetê Zera de dewê Kurmancan zêde yê, nê hetê Qanqalî de dewê Dimilîyan (Kirmancan) estê. Dewê eşîra Çarekan, ver bi Koyê Girwalokî ra benê derg heta tumê dewa Kîlisa enê.

Vayêde boyrazî hetê Koyê Girwalokî ra sipetna, astikê merdimî serdê boyrazî ra ti vanî şikîyenê. Ayam de qisawet estibî. Hetê zimeyî kalan ra hîre qilaweyî asayî. Qilawî her ke bîyî nêzdî çimê merdimî de hendê bîyî girs. Qilaweyî ameyî nêzdîyê dewe. Dewijan nê qilawî çik ê çik nîyî zaf meraq kerdîbî. Pêro pîya vejîyaybî teber. Cinî, camêrd, doman û kalî bi pirîkan teber de bîy. Ti vana mîyan, bizan, ga û mangayan, conegayan, teyr û turan pêrune pîya baldarî qayt kerdêne.

Şiwaneyê dewe SOS qîra “cendermeyîîî…” Hama sifte domanê qicî remayî. Teyr û turî remayî. Cinî û camêrdî zî şîyî zereyê çeyî, çeber peyra zirze kerd. Heme ca bî uskutî.

Cendermeyî şîy verê çeyê Îsê Gozelî. Îs teber de bî. Cendermeyan Îsî ra vat: “İsmail ...mahkemeye çağri pusulaniz var...tarihte mahkeme de olun. Hakkinizda şikayet var. Gelmediğiniz takdirde zorla sizi mahkemeye götüreceğiz, ona göre.!!”

Îs roja bîne şefaqî ra uşt ra, bî espar, dewa paşayê Ginyanî ra raye ramite hetê Zera.

Navçeya Zera de merdimê kurmancî zaf ê. Binê navçe ra ju çem şono. Nameyê tirkî ê çemî Kizilirmak o. Çem Koyê Surî ra vejîyeno, reseno orteyê Sêwazî ra tadîyeno, peynîya xo de xeylê dewan, navçeyan û sukan, koyê girsan ca vera dano, şono reseno Deryayê Sîya.

Îs astorî ra ame war, xeylê qefelîyabî. Astor zî qefelîyabî. Pirnike ra helmo puxirin vejîyayêne. Îsî astorê xo ant axurê ju xanî. Werd û awe da astorî. Badê şî verê adlîya. Îsî qayt kerd ke çi qayt kero, Usiv bi diwês kesî ha verê adlîya de tikmîş bîyo, labelê kam çin o ke, ê ke Îsî de qarînê pêro ha uca yê. Tena Rizê Gomikî, Îsî de nêqarîno. Îsî ferq kerd ke ê ke leyê Usivî der ê pêro şahîdê Usivî yî.

Des û di şahîdê Usivî estê. Na rewşe de şahîdê lacê Gozelî çin bîy. Qîrayîşê mubaşîrî adlîya ra vejîya teber. Usiv bi şahîdan adlîya ra kewtî zere. Heyetê mahkeme zî amade bî. Hakim vat:

- Celsa konu ya, maqamê îddaye, sawcî se vano?

Sawcî uşt ra, cubbeyê xo kerd raşt, serekê mahkemeyî ra vat;

-Birêz serek û mahkemeya berze. Maqamê îddîa, lacê Gozelî, Îsmaîl Gozelî bi nê sucî îsnat keno, dawacî lacê Gomikî, Yusuf Bilgili yo, serba Îsmaîl Guzelî ra se vana, vat:

Usiv oncî kakaz kakaz:

-Si si sawcî beg, Îsmaîl Gozel dewe de vano îta de hukmat ez a. Şima çi wazenê ez îta ro. Dewlet mewlet çin a. Dewlet ez a vano. Ma ser o otorîteyê xo saz keno. Aha şahîdê mi nê yê, îta rê, vat.

Hakimî şahîdan ra pers kerd:

-Şima se vanê şahîdî.

Şahîdan pêro pîya ju fekî ra vat:

-Heya heya, hakim beg, Usiv beg raşt vano, ma Îsmaîl Guzelî ra dawacî yê.

Ney ser o hakim tadîya Îsî ra:

-Ti se vanî Îsmaîl beg.

Îsî gula xo kerde pak, hakimî ra vat;

- Hakim beg naye ke Usiv mi rê îsnat keno, pêro pîya zur ê, îftîra yê, şahîdê mi zî esto. Nê ser o hakimî pers kerd:

- Şahidê to kam o?

Îsmaîlî vat:

- Lacê Usivî, Riza yo.

Hakîmî vat:

-Halla halla, hela bêro.

Şahîdê Îsmaîlî lacê Usivî bî. Hem heyetê mahkeme şaş bîy. Hem zî Usiv bi şahîdanê xo şaş bîy. Şahîdê Îsî, lacê Usivî, Rizê Gomikî ame verê hakimî, hakim Rizî ra persa:

- Riza beg, vatena xo raşt vanî, ser o sond biwere.

Rizî sond werd, hakimî ra û vat;

- Hakim beg, Usiv pîyê min o, labelê Îsmaîl beg cîranê min o. Mi Îsmaîl Begî ra heta nika qe ju xirabîye nêdîye. Çi kêmanîya bîye Îsmaîl Begî destê xo mi rê da ra. Aha, Usiv pîyê min o, ez huzurê şima de ci ra pers kena, heta nika mi rê pîyîye qe kerda, ney. Nafa îftîra erzeno nê mêrikî. Nê şahîdî pêro zurker ê.

Nê ser o hakim şahîdan ra qîra û vat;

- Hesir bê, hesir bê, reyna çimê mi şima nêvîno. Hakim nafa tadîya cendermeyan ra û serba Usivî “nê zî tenê bierzî nezaret” û mahkeme ca da.

Barbarîya Usivî ya, kuzkuza Usivî ya. Nezaret de Usiv pê weno. Usiv verê şanî de verda ra. Îs verê adlîya de ju qawe de ronîşte bî. Peynîya Usivî meraq kerdîbî. Şahîdê Usivî pêro remayî û şîyî.

Usiv lingan ser o zor vindeno. Belîyo ke cendermeyan Usiv merednayo ra falaqa. Halê Usivî ra oncîna zerrîya Îsî veşaye. Şî kewt binê çengê Usivî, Usiv berd ju lokanta de kerd meyman, pîzeyê ey kerd mird. Binê linganê Usivî bibî lîme lîme. Usiv janê linge ra zîbeno, kuzeno. Zîbayîşê xo gegane dano we. Îs damîş nêbi, astorê xo ard verê Usivî, Usiv kerd espar, pîya kewtî raye. Ney ser Îsî Usivî ra vat;

- Nero Usiv, Usivo her û şeytan, to mi rê ju dame saz kerde. Bi xo ginayî piro, la mi de merdimatî esta. Ez merdimêko îtîqatin a, se vajî, heqî belayê xo da to.

---

## Dewey Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## Şewqa

Zemanê verî qeybî verî ro tesîrê çiyê tebera yenê bigîrê şewqa dayêne sereyê xo. Enka zî şewqayê aneyînî estê. Mesela, merdimê karê sazkerdinê keyan kenê qeybî sereyê xo bipawê şewqa danê sereyê xo.

Zehf reyan qeybî zêde rojenêda sereyê înan ro û ê xo ra nêşorê şewqa danê sereyê xo. Helbet qeybî merdim sereyê xo serdî ra bipawo zî şewqa dano sereyê xo.

Welatanê tewir tewiran de şewqayê tewir bi tewirî estê. Mesela Tirkîya de verî şewqa çinêbî, Ataturkî qanûnê “Şoreşê Şewqan” ard û şewqa arde Tirkîya; çiyê danê sereyê xo bedelnaye.

Welatê Skoçya de şewqayê tewir bi tewirî û rengînî estê. Welatanê bînan de zî rewşe anekîya.

Serdemo modern de şar qeybî tewr zêde karîzma bo şewqa dano sereyê xo. Û helbet qeybî kompanî reklam bikerê, logoyê xo danê serê şewqan û ê şewqan konferans, festîval, çalakîyanê sporî, mîtînganê weçînayîşan de şixulnenê. Tam zî meseleya ma na xala peyîne ya.

10’ê aşma vernîya ma de Iraq de weçînayîş esto. Partîyê kurdan zî kunê no weçînayîşê qeybî mebûsîyê Iraqî. Partîyê kurdan YNK û Goran binê nameyê “Koalîsyonê Kurdistanî” de pîya kunê weçînayîş. Ê go mîtîngan virazê û qeybî nê mîtîngan de bişixulnê pêdivîya înan bi şewqayan esta. Înan zî sîparîşê şewqan dayî kompanî Tirkîya. A kompanî qezaya Şalparazî ya bajarê Trabzonî yê Tirkîya de ya. Kompanî şewqayan viraşt û serê şewqayan de "Kurdistan Coalition" (Koalîsyonê Kurdistanî) nuşte. Hendî kamî gilî kerdo, Şaredarê Şalpazarî û zabiteyê ci ameyê a kompanî, ê şewqayan veşnayê.

Ma qe serê helwestê şaredarî de nêvindenê, semedo ke ma zanê ê partîya nijadperest ra yo û neyartîya kurdan keno. Ma hetê xo ra ewnenê mesela ra. Û ma çende persan kenê…

Welatê ke nêşko şewqan miyanê qeza û bajaranê xo de virazo o welat go senî bibo welat? O welat senî welat o? Welato ke pêdivîya ci bi hezaran çiyan bibo û ê hezaran çiyan heminan, yan zî sera newayê ci tebera bigîro o welat go senî bieşko raver şoro? Ma hewce nêkeno ma serê nê persan û persanê anayinan de bifikiriyê... Ma çende persanê şexsî zî bikerê…

Çirê şima şiyê bajaro ke her kes zano bajarê nijadperestan o de şewqayan dayê viraştiş? Sewbîna bîn kompanî çinê bî ke şewqan virazo şima şî ewca? Şima nêeşkayê şorê bajarêke bîn? Mesela Stenbol de zehf kargehê kurdan estê, çirê şima nêşî verê înan? Sewbîna kurdî nêbê zî, Stenbol de zehf kompaniyê bînî estê û qeybî Başûr kar kenê, çirê şima nêşîyê ewca? Kamî rey mote ra şima ke şima şîyî bajarê nijadperestan? Rayberê şima kam bî?

Go kam bersivê nê persan bido. Yan zî go bersiv bido yan nê. Ez nêzana. Axir meselaya ma giran a.




# Tiştanok (mamik)



**1-** Tiştek min heye
Dîzika xemexume
Tijî nanê genim e
Gelo ew çi ye?

**2-** Tiştek min heye
Mamê mino
Du birane
Yek yekî nabîne
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**

**1-** Hejîr,Kewara mêşên hingiv **2-** Guh

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin.
De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bibêje:
**Şev reş e**
**Şûv reş e**
**Miya reş e**
**Berx li ber e**
**Ez ji hev dikim dere**

→ Heke nikaribî wê bibêjî ka vê biceribîne:
**Şivên sofî Sîso şeş in**

***Çavkanî: Zûgotinok***
***Berhevkar: Mihemedê Kurdo***



# XAÇEPIRS




### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Paytexta Sûriyeyê 3. Zeviyê ne bejî
5. Cihê ku sewal lê tên xwedîkirin 6. "Karê sêwî, nabe…"
7. Rengek 9. Paytexta Ermenistanê 12. Edebiyat
14. Navê rojeke hefteyê 15. Paytexta Tirkiyeyê
17. Cihê ku genim lê dihêrin
18. Hewa 22.Morîstan

### JI JOR BER BI JÊR

1. War, dews, şop 2. Destvekirîtî
3. Agir 4. Kar, xebat
5. Navekî keçan, bi wateya ji agir
7. Siwarê hespê
10. Don, tiştê ku gelek xwarin pê tê pijandin
11. Nalîn
13. Gelê ku bi hejmara xwe, yê herî zêde ye li Rojhilata Navîn
14. Perestin 16. Kok
19. Berê li gundan rêveberiyeke zordest dimeşandin û gelekî zilm û zor dikirin 20. Qul
21. Notayeke Mûzîkê
23.Bi ingilîzî kurtenivîsa erê an jî temam

Bersiva hefteya borî




Şûjin

Dildarê Amedê

## Milîtarîzma perwerdeyê

Di pergala perwerdeyê ya li Sûriyeyê de, di dibistana navîn de hefteyê rojekê dersa leşkeriyê hebû. Ne tenê di dibistana navîn de lê di ya amadeyî û heta li zanîngehê de jî salê 18 rojan em dibirin kampeke leşkerî û perwerdeya leşkerî didan me.

Jixwe cilê me yê dibistanê jî di rengê yên leşkeriyê de bûn. Di hefteyê de carekê em dibûn leşker û me perwerdeya leşkerî didît. Perwerdekarê me jî leşkerek bû û çawa bi leşkeran re dide û distîne wiha bi me re dida û distand. Xwendekar gelekî ji wan perwerdekarên leşkerî ditirsiyan ji ber cezayê giran didan kesên ku şaştiyekê bike.

Di dema dibistana navîn de navê perwerdekarê me Îsa Zeytûno bû. Mirovekî leşker, faşîst û madtirş bû. Ew bi eslê xwe suryanî bû lê ji bo girêdana xwe bi partiya Baasê û rejîmê re bide xuyakirin wî ji ereban jî bêtir faşîstî dikir.

Min nizanibû ku kekê min Îsa Zeytûno nas dike, beriya wê bi rojekê ew û birayê min hev li ciyekî dibînin û birayê min westiya min lê dike dibêje Dildar li dibistana te ye û haya te jê hebe.

Rojekê serê sibehê dersa me ya pêşî dersa leşkeriyê bû. Em bi rêz weke rastkêşê li pey hev rawestiyabûn û Îsa Zeytûno hat li pêşiya me rawestiya. Bi dengekî bilind û madekî tirş navê min xwend û got were vir. Min bi tirs û fikar baz da û çûm ber wî rawestiyam. Min silava leşkerî dayê û navê xwe got. Ji min re got: "Ka te çima kumê leşkerî nedaye serê xwe." Min jî di cih de got: "Bibore min ji bîr kiriye, soz didim ez ê careke din ji bîr nekim." Li şûna wî madê wî yê tirş pirqînî pê ket û ji min re got: "Kuro ma ne wa ye kumê te li serê te ye." Kumê min li serê min bû lê ji tirsan re min bê hemdî ew bersiv dayê.

Li zanîngehê jî her saleke xwendinê em 18 rojan diçûn kampa leşkerî û li wir êdî bi cilên leşkerî em beşdar dibûn û di çadiran de radizan, bêhna potînên me yên leşkerî difûriya ezmanê heftan û em li ser hin çekan jî perwerde dibûn. Dersa herî zêde me didît, vekirin û siwarkirina keleşê bû. Werhasilî me 18 rojan rezaleteke mezin ji destê wan leşkerên hov dikişand. Piraniya wan gelekî ji xwendekaran aciz bûn û kîneke mezin li dijî wan didan xuyakirin. Hesreta me vexwarina çayeke germ bû. Me çaydanek ji xwe re di nava konê xwe de veşartibû. Rojekê me qirş û qal dan hev, li wê çola xwedê ji xwe dar û êzing tune bûn. Me bi qirşik û stiriyan ji xwe re bi zor û heft belayan çayek çêkir. Piştî çaya me amade bû hevalekî me bi navê Xêro hebû. Qutîkeke rîçalê ew ê yek kîlo ji xwe re şûştibû û anî danî ber çaydanê û ji min re got çaya min dagire. Min got: "Kuro lawo ancax çaydan têra vê qutîka te bike ma wê hevalê din çayê venexwîn." Me got û negot Xêro got: "Heta tu vê qutîka min danegirî ez dora xwe nadim kesekî." Yek ji min yek ji wî, min kir û nekir Xêro nehat rê. Rabû hema min bi çaydan girt û bi erdê da kir. Piştî ewqas tirs, westan û dûman û hêsrên çavan çaya me bi erdê de çû. Wek tu cerekî av bi ser hemû hevalan da bikî. His û deng ji kesekî nehat. Xêro qutîka xwe bi acizî li erdê da û di ber xwe de bû pinpina wî. Hema yekî din nema xwe girt û qutîka di destê xwe de li nav serê Xêro da. Me bi zor û heft belayan ew ji hev kirin lê baş bû ku haya perwerdekarên leşkerî ji me çênebû.

# Morî mircanên sebr û şahiyê

Felatê Qoserî

Tizbî ango kevirên sebrê... Kevirên sebrê ji aliyê hostayên bisebr, bi kedeke mezin têne amadekirin.

Di nava kurdan de çanda tizbiyê zêde pêş ketiye. Di civatekê de ango li kolanekê di destê her kalemêrekî an jî pîrejinekê de tizbiyek tê dîtin. Di civaka me kurdan de tizbî, an wekî amûra sebrê; an wekî amûra kêf û şahiyê, an jî wekî amûra selawatan tê kişandin.

Dema ku mirovan dest bi neçîrvaniyê kir, hestiyên nêçîra xwe bi dar ve dikirin û ji bo di neçîreke din de bextê wan vekirî be, bi xwe ve girê didan. Piştî demekê ji bo xwe ji xerabî û nexweşiyan biparêzin di şer de jî ev hestiyên bi dar ve dikirin, bi xwe de dikirin. Rêzkirin û darvekirina morî, mircan, hestî, kevir û daran a li ser ta, bi qasî dîroka mirovahiyê dirêj û dûr e. Navê tizbiyê ji erebî koka "subha" hatiye. Di nava civakê de kesên ku tizbî nexistibe destê xwe û heb bi heb di nava tiliyên xwe re derbas nekiribe pir kêm in. Li gorî hin rîwayet û çîrokan, cara yekem ji aliyê brahmanan ve hatiye dîtin û kişandin. Hin rîwayet jî didin zanîn ku di sedsala 11'an de, di medreseyan de wekî amûra duakirinê hatiye emilandin

Mircanên darvekirî, cara ewil li Hindistanê di baweriya hindûyan de ji bo xwendina duayan hatine kişandin. Çanda tizbiyê di destpêkê de ji Hindistanê ber bi rojhilat, ji rojhilat ber bi Rojhilata Navîn, ji rojhilata navîn jî ber bi Ewropayê belav bû.

Di hemû civak û dînan de armanca bikaranîna tizbiyê nêzî hev in. Li gorî xirîstiyanî, hindûîzmê, bûdîzmê û mislimantiyê armanca bikaranîna tizbiyê rêzkirin û jimartina duayan e. Di gelek civakên bawermend de an ji bo piştî nimêjê li hemberî xwedê xwe duayan bike, an ji bo karê hesabgiriyê bikin hatine kişandin.

Di alema îslamê de şekl û teşeyê tizbiyê nêzî hev in. Bi piranî tizbiyê alema îslamê 33 û 99 hebin. Li gorî 99 navên Xwedê Teala hatine rêzkirin. Her hebeke tizbiyê navekî xwedê zikir dike. Di tizbiya 99 hebî de her ji 33 heban nîşaneyek heye.

Tizbî di cîhan û alema îslamê de cihekî taybet digire. Her wiha di Quranê de jî derbas dibe. Di hin ayetên Quranê de wiha tê gotin: "Hemû tiştê li erd û ezman Xwedê zikir dike, 7 esman, erd û tiştên di hundirê wan de Xwedê zikir dike. Tu tiştê ku ji Xwedê re zikir neke tune ye."

Hin çîrokên din jî li ser tizbiyê hatine gotin. Li gorî riwayetekê tê gotin ku Veysel Qaranî diçe Yemenê Hz. Muhamed bibîne. Lê dema ku wî nabîne pir xemgîn dibe. Di vegerê de diranê pêxember yê di şerê Ûhudê de şikestî bi xwe re tîne. Piştre 32 diranên xwe jî dikişîne û bi ta vedike. Tê gotin ku tizbî cara yekem wisa çêbûye.

Di çêkirina tizbiyê de madenê wekî heqîq, zêr, cam, almast, fîrûze, zîv, arpeşk, katalîn, lapis lazulî, kevirê lûle, malekit, necef, kevirên oltû, kevirên yaqût, zebercet, zumrut û hwd. An jî hestî û laşê heywanan yên wekî hestiyê deveyê, diranên fîl, qoçê gergedan, qoçê ga, mircan, neynûk û hwd. Ango nebatiyên wekî abanoz, dara gulê, dara guzê, kehrîbar, kenêr, nebik, dendika zeytûnê û hwd hatine darvekirin (bikaranîn).

Tizbî li gorî teşe û şeklên xwe; tizbiyên feqîran, tizbiyên zengînan, tizbiyên



paşayan, tizbiyê keyayan û hwd. hatine polînkirin.

Demekê hin tizbiyên bi qasî 500 an jî hezar hebî hebûn û di TIP'ê de dihatin bikaranîn. Hebên wan qasî findiq an jî gûzan mezin bûn. Di hundurê van tizbiyan re kesên nexweş derbas dikirin.

Hin teşeyên tizbiyan li gorî hebên xwe tên senifandin: Tizbiyên gilover, tizbiyên pahn û tizbiyên dirêj.

Tizbî, niha li Amed, Mêrdîn, Erzirom, Îznîk, Eskîşehîr, Stenbol, Silemaniyê û çend bajarên din têne çêkirin.

Çêkirina tizbiyê qasî dîroka xwe kedeke mezin dixwaze.

Ji bo çêkirina tizbiyekê tenê keda destan û sebir ne bes e. Her wiha ji bo çêkirina tizbiyekê, ta, derzî, bader û pense amûrên sereke ne. Tiştê ku nirxê tizbiyê zêde dike û bi qîmet dike, li gel kevir û madeyê wê; ked û hostetiya wê ye jî. Ji bo her hebeke wê an jî hûnandina tayê wê hunereke cuda û estetîkeke cuda pêwîst e. Her wiha tizbî bi îmame, gulik û biskula xwe rengekî taybet digire. Li aliyê din nexşe û xemla li ser hebên tizbiyê tizbiyê hîn bêtir bedewtir û xweşik dike. Lê tizbiyên ku hebên wan bê nexş û sade jî pir kubar û delal in. Tizbiyên ji bo îbadetê zêdetir 99 hebî ne û hebên wan ne zêde mezin in. Her wiha ji her 33 heban carekê nîşaneyek heye.

Tizbiyê ji bo sebrê û kêfê hîn zêdetir bi hunereke mezin û sebreke mezin têne amadekirin û hûnandin. Her çiqas ji bo amadekirina hebên tizbiyê kedek hebe jî di amadekirina îmame, gulik û biskula tizbiyê de serêşandin, sebr û kedeke taybet heye.

Tizbiyên ku taybet têne çêkirin gulik, biskul û îmameyên wan li gorî daxwaza xwediyê xwe tên çêkirin. Hin kes gulikên rengîn, hin kes gulikên zîv û zêr, hin kes gulikên ta dixwazin.

Tizbiyên ku di nava çanda civakê de cihekî berfireh girtine û li her malê tên dîtin di 10-15 salên dawî de wekî berê eleqeyekê nabînin û ev hunerê bi sedan salan hêdî hêdî amadekariya koça xwe dike.

# Sînemayeke Çawa; Yılmaz Guney û Xelîl Dag



Îlham Bakir


Tişta ku hiş û giyanê mirov heyî dike; tişta ku hêza biryardayîn, pêkanîna biryaran dide mirov jî asta têkiliyan e ku mirov di navbera hebûna xwe ya takekesî û civakîbûna xwe de datîne. Di vê çarçoveyê de gava ku mirov li mijarê bifikire, tişta ku pêşketina mirov û têkiliyên di nav parçeyan de diyar dike, nêzikatiya giştî û yekgirtî ye. Divê mirov vê rastiyê têbigihîje.

Tişta ku pêxemberan, feylezofan, zanyaran û hunermendan ji mirovên din cuda dike, wan dike pêşeng, pêşbîner, rexnegir, rênîşander û rêberên civakê têgihîştina wan a der barê kûrbûn û firehbûna têkiliyên navbera parçe û tevahiyê de ye. Modernîzmê li ser navê zanistbûnê parçe ji tevahiyê qut kir, heqîqet dabeş kir û wek parçeyên ji hev cuda nirxand. Li hemberî vê nêzikahiya pozîtîvîst û rêbaza dahûrandinê ya ku rexneyên herî xurt bi pêş xistiye têkiliya navbera parçe û tevahî bi awayê herî kûr têgihîştiye û di şûna ku bi hişmendiya analîtîk nêz bibe de wijdan, exlaq û hestê esas girtiye huner e.

Sînema jî wek hunera serdema nûjen derketiye holê. Mirov dikare bibêje ji bo parçekirina civakê heta şaneyên wê dabeşkirin, berovajîkirina rastiyê ji hunerên din qat bi qat zêdetir bandorker bûye. Kurd û Kurdistanê jî bi êrîşên modernîzma lîberal ên takekesparêz ên serdema me re rû bi rû mane. Rastiya kurdan û Kurdistanê wek rastiyeke ku herî zêde hatiye berovajîkirin wek navgîna sînemayê hatiye bikaranîn. Ev rastiya gel rastiyeke wisan e ku li erdnîgariya Mezopotamyayê şaristaniyên mezin ava kirine, ked daye û ragihandiye. Lê ev rastî veguherandine rastiyeke ku nav û hebûna kurdan bi xwe jî hatiye înkarkirin û em dikarin bi awayê vegotina kurdan a di sînemaya Tirkiyeyê de vê yekê zelaltir bibînin. Bi tenê wek gundiyekî xwediyê tirkiyeke çelexwarî, nezan, çors, dinyanedîtî karibûye di sînemaya tirkî de cih bigire. Kurdan demeke dirêj e ne wek karakter, lê wek tîpên ku li jorê taybetiyên wan hatin gotin dikaribûne di sînemayê de cih bigirin. Lê encax bi sînemaya Yilmaz Guney re kurdan dikaribûye li ser perdeya sînemayê wek karakterên bi rih û can ên ku digirîn, dikenin û îtîraz dikin cih bigirin (Sürü – Kerî, Yol – Rê, Umut – Hêvî, hwd). Ev karakterê ku di sînemaya Yilmaz Guney de bi xwîn û goşt bûye bi sînemaya Xelîl Dag bi karakterbûnê nemane, ji kurdên bindest û mazlûm veguherîne kurdên berxwedêr û têkoşer (Bêrîtan, Tîrêj, Eyna Bejnê û hwd).

Yekî kurd di sînemayê de wek karakter şênber kirine, yê din jî rêwîtiya kurdan a ji hebûnê veguherîna hebûneke azad vegotiye. Her du derhêneran jî kameraya xwe daniye hemberî gelê ku vedibêjin. Kamera carinan li ser sifreya van mirovan bûye, bi wan re pariyên xizaniyê parve kiriye, carinan jî veguheriye hêrsa wan a ku li hemberî serdestan diteqe. Nêzikahiyên lîberalîzmê yên di bin navê objektîfî û bêalîbûnê de rastiya gelan û bindestan manîpûle dikin. Li dijî vê nêzikatiyê wan kameraya xwe li nîveka çîroka bindestan bi cih kir û aliyê xwe bi awayekî pir zelal diyar kirin. Bi vî awayî jî gava ku têkiliya rastî û estetîkê ji nû ve tê sazkirin divê mirov li ku derê bisekine bêyî dudilî nîşan dan.

Sînemaya ku wek rêwîtiyeke hunerî ye li gel her du sînemageran jî wek lidijderketina hemberî parçebûna civakê pêk hatiye wek rêbazeke têkoşînê, wek lêgerînekê, wek ji nû ve avakirina rastiyekê derketiye holê. Di çavên Yilmaz Guneyî de hêrsa li dijî têkbirina civakê, êş û xema tenêbûn û neçariya takekes dixuyê. Her dîmena ku kişandiye li gel van rastiyan hatiye kişandin. Xelîl Dag jî dîmenên xwe ji êş, xem û hêrsa rûyê Yilmaz Guney dawerivandiye û veguherandiye rûgeşiyeke nemir. Ev rûgeşî di her dîmena fîlmên xwe de veguherandiye hêviyeke mezin a jiyanê û hêzeke têkoşînê. Wan bi kedeke mezin sînemaya xwe gav bi gav honandin û di vê atmosferê de destûr nedan ku tu durûtî û sextekarî bi pêş bikevin. Sînemaya wan dişibiya jiyana wan, jiyana wan dişibiya sînemaya wan. Ger ku em bixwazin sînemaya gelan, sînemaya hêviyan çêbikin, divê em bi tenê li fîlmên Yilmaz û Xelîl nenihêrin, divê em li rûyê wan binihêrin, li jiyana wan a ku rengê xwe daye rûyê wan binihêrin, li hezkirina wan a ji gelê xwe binihêrin, divê mirov çavê wan ji xwe re bike rêber. Ji bo sînemaya Kurdistanê ya ku ji dilê van her du derhêneran diniqute dê sînemaya êş û janê, hêrs û xemê, hêvî û têkoşînê bê gotin.





# xwebûn

20-26 Îlon 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 92

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85


# Rêwîtiya tûtinê û dîroka wê

Navenda Nûçeyan

Dema em dibêjin tûtin, tûtina Xursê, tûtina Licê, tûtina Semsûrê, tûtina Şemzînanê û tûtina Bedlîsê tê bîra me kurdan. Kesên cixareyê dipêçin û dikişînin, baş ji tam û bêhna tûtinê fam dikin ku tûtina kîjan bajarî ye. Tiryakên tûtinê bi ruh û kezeba wê zanin ku ya kîjan newal û geliyî ye. Ji tûtina Xursê bigire heta ya Mûşê, ji ya Semsûrê bigire heta ya Meletiyê, Semsûr, Bedlîs, Şemzînanê ji her celeb tûtinê fêhm dikin. Kurd herî zêde cixareyê dipêçin û cixareyên pêçayî dikişînin. Heta 10 sal berê di bêrîka her kurdên cixarekêş de qutiya tûtinê û hestê wî yê benzînê hebû. Lê hikûmet ji bo rê li pêş vê yekê bigire û bêtir cixareyên TEKEL'ê bifiroşe û pere biçin ji sermayeya dewletê re rê li pêş firotina tûtinê digire.

Îro li tevahiya cîhanê 1.1 milyar kes tûtinê dikişînin û tiryak in. Heta niha kesên ji ber cixareyê mirine 7.7 milyon in. Li gel vê rastiyê hejmara kesên tûtinê dikişînin zêde dibe. Dîsa li gel vê rastiyê temenê kesên tûtinê dikişînin her ku diçe biçûk dibe. Dema em li dîrok û çîroka tûtinê dinêrin, em dibînin ku kişandina tûtinê hezar û 500 sal in didome.

Niştecihê parzemîna Amerîkayê ango çermsoran tûtin ne ji bo kêfê ji bo ayîn û îbadetan de ji aliyê şamanên bi tecrûbe dihat kişandin. Lê piştî ewropayî çûn Amerîkayê keşif kirin û tûtin dîtin, vê carê tûtin ji armanca wê derxistin û ji bo kêfê kişandin. Piştî ku ewropayî fêrî tûtinê bûn, dest bi mêtingeriya başûrê Amerikayê kirin. Amerîkayiyan koleyên reşik anîn li Amerîkayê bi cih kirin û dest bi çandiniya tûtinê kirin.

Li gorî çavkaniyan tûtin di salên 1490/1500'î de amerîkayiyan bi rêyên keştiyên îspanyoliyan anîn Îspanyayê û ji wir anîn Ewropayê. Piştî tûtin li Ewropayê belav bû, vê carê bazirganên Venedîkî di salên 1600'î de di serdema Osmanî de anîn axa Anatolyayê. Ji vir jî derbasî Asyayê bûye. Cara yekemîn li San Salvadorê tûtin hatiye şewitandin û kişandin.



Pelên tûtinê ji aliyê çermsoran ve pîroz hatiye dîtin û pelê wê di rojên şahî û bernameyan de hatiye pêxistin. Di serdema Maya û Aztekan de jî keşeyan di îbadetên baweriyê de agir bi tûtinê xistine û şewitandine. Piştî demekê pelê tûtinê wekî derman danîne ser birînan û derman kirine.

**Tûtin bû berhema bazirganiyê**

Li Misir û Mezopotamyayê jî agir bi pelê tûtinê xistine û ji dûxana wê sûd girtine. Tûtina ku heta salên 1600'î di ayîn û îbadetên baweriyê de dihat pêxistin, piştî sedsala 16'an vê carê li welatên Ewropayê kirin amûra bazirganiyê û li welatên Hindistan, Çîn û welatên Rojhilat belav kirin.

Di salên 1600'î de cara yekemîn tûtin bi keştiyên îngilîz, îtalyanî û îspanyoliyan anîn Stenbolê û li Tirkiyeyê belav kirin.

Li welatên cîhanê heta sala 2002'an herî zêde li Çînê û piştre li welatên Amerîka, Hindistan, Rûsya, Almanya, Endonezya, Japonya û Tirkiyeyê tûtin hatiye çandin.

Li Tirkiye û cîhanê her ku diçe kesên cixareyê dikişînin zêde dibin. Li gel ku yên cixareyê dikişînin dizanin cixare zerarê dide tendirustî û aboriya wan, dîsa jî dikişînin.

Li gorî daneyên Kovara Tibê ya Navdewletî ya Lancet, li cîhanê hejmara kesên cixareyê dikişînin 1,1 milyar e. Li gorî lêkolînê di nava 10 welatan de Tirkiye jî heye. Lêkolînên hatine kirin destnîşan dikin ku kesên ji ber cixareyê mirine 7,7 milyon in. Ji her 5 zilamên ku dimirin 1 ji wan ji ber cixareyê dimirin.

Li gorî rapora Kovara Lancet ji sedî 89 kesên ku cixareyê dikişînin heta 25 saliya xwe bûne tiryak. Li hemû welatên cîhanê her ku diçe temenê kesên cixareyê dikişîne biçûk dibe.

Tûtin niha li gelek bajarên Tirkiyeyê tê çandin û bazirganiya wê tê kirin. Herî zêde li herêma Ege, Marmara, Deryaya Reş û Kurdistanê tê çandin.

Li Herêma Egeyê herî zêde li der û dorê Çemê Gedîz, Bakirçay û Menderesê tûtin tê çandin. Li Herêma Deryaya Reş jî tûtin herî zêde li Samsûn, Beriya Bafra, Alaçam, Ladik û Vezîrkopruyê tê çandin. Li Herêma Marmarayê jî herî zêde li Başûrê Marmarayê tê çandin. Li bajarên Balikesîr û Bûrsayê zêde tê çandin. Li Kurdistanê jî herî zêde li Şemzînanê ya Colemêrgê, Hîzana Bedlîsê, Mûş, Licêya Amedê, Çêlikan a Semsûrê, herêma Xursê ya Mêrdînê, Meletî û Sêrtê tê çandin.

Li Tirkiyeyê ji ber kotayê datînin ser çandiniyê, sal bi sal cotkarên tûtinê kêm dibin. Di salên 1980'î de li Tirkiyeyê 600 hezar malbatan debara xwe bi tûtinê dikir. Lê piştî di sala 2001'ê de xala 4733'an a kota xistin meriyetê, hejmara cotkarên tûtinê ji 477 hezar û 829 kesan daket 333 hezar û 761 kesan.

Vê zagonê herî zêde bandor li ser hilberîner û cotkarên tûtinê yên Kurdistanê kir.

**Li Tirkiyeyê hilberîna tûtinê**


Tûtin di navbera mehên gulan û cotmehê de tê çandin û komkirin. Ji hewa germ hez dike. Di mehên gulan, hezîran, tîrmeh û tebaxê de bejna wî bilind dibe. Di meha îlon û cotmehê de jî tav digire. Tûtin herî kêm ji germahiya 13-15 pileyan û herî zêde ji 35-38 pileyên germahiyê hez dike. Li bajarên navborî zêde germ û sar çênabe. Li gel ku erdnîgariya gelek bajarên Tirkiyeyê ji çandiniyê re guncav e jî piştî hikûmeta AKP'ê êdî rê li pêş çandiniyê hat girtin.

Piştî zagona kotayê danîn pêş tûtinê li Tirkiyeyê sal bi sal hilberîna tûtinê kêm bû û îthala tûtinê zêde bû. Di sala 2006'an de hilberîna tûtinê li Tirkiyeyê 39 hezar ton bû. 72 hezar ton îthal kirin. Hilberîn sal bi sal kêm bû, îthal jî sal bi sal zêde bû. Di 2017'an de hilberîn daket 13 hezar tonî, îthalat jî derket 96 hezaran. Ev jî nîşan dide ku hikûmeta AKP'ê rê li pêş hilberînê girt û rêya îthalê li tûtinê vekir. Bi vê yekê Tirkiye zêde bi welatên derve ve hat girêdan.

**Astengiyên li pêş firotina tûtinê**

Wezareta Çandinî û Daristanê, di 1'ê tîrmeha 2021'ê de ji bo tûtinfiroşan qanûneke nû derxist. Li gorî vê qanûnê kesên ku "belgeya karbidestiyê" ji Wezareta Çandinî û Daristanê negirin, nikaribin tûtinê bifiroşin. Kesên bêyî "belgeya karbidestiyê" bazirganiyê bikin, dê ji 3 salan heya 6 salan ceza li wan bê birîn. Piştî vê zagonê li Semsûr, Meletî, Amedê bi hezaran cotkarên tûtinê kom bûn û çalakî li dar xistibûn û bertekên xwe anîbûn ziman. Lê hikûmetê di guhertina zagonan de gav paşve neavêt.

# Nexweşiya Epîlepsiyê



Fzt. Mustafa Onal

Epîlepsî (fê, edr), nexweşiyeke mêjî ye. Ev nexweşî mirovan bê hiş dixe. Bi talerz û pêgiriyan li ser jiyana nexweşan bi bandor e. (Pêgirî, rewşên ji ber nexweşiyan yan jî fîzyolojiya mirov çêdibin. Di epîlepsiyê de pêgirî, pir caran bi ta û lerzê ve derdikeve. Pêgirî di nav gel de wekî [nobet]ê; talerz jî wekî [hewale]yê tê zanîn.)

Epîlepsî, pir caran di dema pêgirî û talerzê de kefê bi ser devê nexweşan dixe.

Di nav lebatên mirov de rêveber mêjî ye. Mêjî, bi rêya rehikên li her derê laş belav bûne agahiyan digire, van agahiyan dinirxîne û li gor vê nirxandinê fermanên xwe bi rêya rehikan digihîne her derê laş. Em mînakekê bidin. Dema em çav marekî bikevin, rehikên me yên di vî warî de peywirdar bi agahiyan mêjî hişyar dikin. Piştî nirxandina li mêjî çalakî derdikevin holê. An em ê li mar bidin an jî em ê birevin. Mirovên bitendirust bi vî awayî tevdigerin. Ji ber ku dizanin rewşa tê de xeternak e û divê bertekekê nîşan bidin. Ev ragihandina di navbera mêjî, rehik û laş de bi rêya elektrîkê pêk tê.

Hemû şaneyên mêjî bi rêya elektrîkê ji hev haydar dibin. Bi kurtasî bi saya aheng û pîvaneke bêhempa em tev digerin. Lê carina ev ahengî û pîvan têk diçe. Birêkûpêkiya elektrîkê têk diçe. Elektrîk xwe bi xwe û zêde belav dibe. Piştî vê rûxandinê pêgirî, ta, lerz, bêhişketin xwe didin der. Ev rewş bibe domdar wekî nexweşiya epîlepsiyê tê pênasekirin.

Gelek cureyên epîlepsiyê hene. Ji ber vê yekê sedemên epîlepsiyê jî pir in lê kîjan sedem dibe sedema kîjan cureya epîlepsiyê ne misoger e. Em dikarin hinek sedeman wisa rêz bikin:

•**Sedemên zikmakî:** Pirsgirêkên kromozoman, nexweşiyên jînkarî (metabolîkî), nebûn an jî kêmbûna hinek enzîman.

Ji ber ku li vir navên kromozom, metabolîk, enzîmê derbas dibin, em dikarin bi kurtasî wan jî rave bikin.

**Kromozom:** Hilgirên taybetî û nîşanên mirovan in. Hemû taybetiyên zikmakî pêk tînin. Taybetiyên dê û bav derbasî zarokan dikin.

**Metabolîk:** Jînkar. Hemû bertekên kîmyasal ên bi jiyanê re pêwendîdar in.

**Enzîm:** Proteîn e. Di şaneyan de tên hilberandin. Katalîzor e ango bizav, bertek û çalakiyan bi lez dikin.

•Girêkên di mejî de derdikevin

•Menenjît (kulbûna mêjî)

•Çixare, vexwarinên serxweşker, tiştên bêhişker

•Trawma (piştî rûdanên xeternak êşandina mêjî)

•Ji carekê zêdetir pêkhatina talerzê

Epîlepsî, gelek cure ne. Hinek bixweber derbas dibin, hinek hewceyî dermanan in. Hinek jî giran in. Lê cureya epîlepsiyê çi be jî divê ev nexweşî di bin çavdêriya bijîşk de be. Divê malbat pêşniyarên bijîşk bi rêk û pêk bînin cih.

Heta vir em di der barê epîlepsiyê de hinekî serwext bûn. Lê ka di dema talerzê de, di dema pêgiriyê de ango di dema nobetê/hewaleyê de em dikarin çi bikin û divê em çi nekin? Fermo em bi hev re hîn bibin.

•Berî her tiştî divê derdora nexweş vala be. Alavên xeternak li derdorê hebin divê bên dûrxistin û divê mirov li dora nexweş berhev nebin ku bêhna nexweş derkeve.

• Divê em nexweş bizivirînin ser kêlekê û tiştekî nerm (balîf û hwd.) têxin bin serî.

•Divê em devê nexweş vekirî bihêlin ku zimanê nexweş neçe paş û hilma nexweş neçikîne lê divê em tiliyên xwe yan jî tiştekî din nexin dev. Di dema talerzê de laşê nexweş bi dijwarî dişide. Dema em tiliya xwe bikin dev ji bo ku vekirî bimîne dibe ku tiliya me yan jî diranên nexweş bişikên.

•Divê em kincên nexweş sist bikin ku hilma nexweş neçike.

•Xwarin di dev de hebe divê em derxînin.

•Berê pîvaz didan ber devê nexweşan, kolonya û av li wan dikirin, li wan didan ji bo ku bên ser hişên xwe lê tevgerên wiha xeternak in. Jixwe dema talerzê heye. Heta ew dem biqede armanca me domandina danûstandina hilmê ye.

•Ji dermanên bijîşk dane pêve tu dermanan bi kar neynin.

•Epîlepsî, ne nexweşiyeke dînbûnê ye. Ez li gelek cihan lê rast hatime gelek malbat wekî ev nexweş dîn bûne tevdigerin. Dibêjin cin hatine dorê, ji ber vê xwe winda dikin, dîn dibin. Dikevin rêya mela û şêxan ji bo ku nivîştekê çêbikin. Tevgerên bi vî awayî pûç û betal in. Li derdora we jî mirovên wiha hebin wan hişyar bikin ku epîlepsîbûn ne dînbûn e.

•Serî li bijîşkên norolojiyê bidin. Li gorî daxwaz û pêşniyarên bijîşk nêzî nexweşan bibin.